

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn



hejmar 66 | 2016



<http://apecpublishing.com>



GRANIAS TARAR



Weşanxaneya APECê



Xeber:

Platforma Kurdên Anatoliya Navîn ava bû

Li bajarê Goteborgê bi beşdariya gelek delegeyan Platforma Kurdên Anatoliya Navîn li Ewropayê (PKAN-E) di roja 17.10.1015an li bajarê Goteborgê Swêd, bi beşdariya 50 delege û 100 mêvanên ji 8 welatên Ewropayê ava bû.

Parlamentera HDPê berê ya Rihayê Leyla Guven, siyasetmedarê kurd û endamê KNKê Adem Ūzûn, hevserokê rêxistina HDPê ya Konyayê Hasan Ateşçî, serokê Kurd-Derê Ankara Mustafa Karaman, parlementerê Partiya Sosyal Demokrat a Swêdê û endamê Komîsyona Têkiliyên Derve, Serkan Köse, parlementerê cîgir ê Partiya Sosyalîst û alîkarê şaredarê Gladsaxa Danîmarq Serdar Benlî, parlementerê berê yê HDPê yê Wanê Ozdal Uçer, komek ji Komeleya Kurdên Anatoliya Navîn (KONKURD-AN) jî amade bûn.

Di kongreyê de ji Elmanyayê Dîlan Biçer û ji Swîsreyê ji Şevket Bakan weke hevserokên Platformê hatin hilbijartin. Navên di Rêveberiyê de cih girtine jî ew in; Bengü Çelik, Yusuf Özden û Raşit Bulduk-Swêd, Semra Akçakoca-Awûstûrya, Ronî Yıldırım û Seyit Ekeçik-Hollanda, Nedîm Ateş-



Norwêç, Sînan Behzatoglû, Aygün Akdoğan û Cengîz Bînyil-Almanya, Muzaffer Küçükyıldız-Swîsre, Süleyman Avcı û Ahmet Gezer-Danîmarka.

Ji Hollandayê Mustafa Kaçmaz, ji Danîmarkayê Ahmet Biçen, ji Swêdê Ozlem Sığırcı-Işıklı û Yakup Sarı weke endamên cihgir, ji bo Desteya Disîplîn û Kontrolê jî ji Swêdê Hasan Bozlak û Deniz Uzuner, ji Danîmarkayê jî Erol Karaman hatin hilbijartin.

Ji bo berdevkiya platformê jî Ahmet Gezer, berpirsariya çapemeniyê Dîlan Biçer û Ahmet Gezer hatin hilbijartin.

Di kongreyê de komîsyonên rêxistinbûyîn, ziman, çand, huner, dîrok û malî hatin avakirin.

Platforma Kurdên Anatoliya Navîn, di bin navê *Platformen för kurder från Centrala Anatolien i Europa* li bajarê Goteborgê komeleyek ava kir. Di heman demê de di bin navê *Platforma Kurdên Anatoliya Navîn* de li Hollandayê weqfek ava kir. Platforma Kurdên Anatoliya Navîn wê bi rêya van her du saziyan bixebite.

Çavkanî: www.anfkurdi.com

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.

Çar mehan carekê derdikeve.

Utges av Apec Förlag AB

hejmar 66 | 2016

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê

Ali Çiftçi, Dr. Mikaili, Xizan Şilan, Muzaffer Özgür,
Jordan, Nuh Ateş, Seyfi Doğan, Mem Xelikan, Hesen
Huseyîn Deniz, Kemal Harimci, Rohat Alakom,
Yalçın Polat, Memduh Selim

Adress

Navnîşana li Swêdê

Box: 8121, SE 163 08,

Spånga/Sverige

E-post

info@apetryck.se

Internet:

www.birnebun.eu

Têkili/Îlişki

Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83

Belavkirin / Dağtım

Ewropa:

Muzaffer Özgür

Birnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medyâ Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 5 TL

Abone

Swêd: 400 SEK • Almanya 50 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Îşveç hesap numarası: (Birnebûn) bankgiro: 402-2224

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / Îşveç dîşındaki aboneler için

APEC, "Birnebûn" Bankgiro-Stockholm/Sweden

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap / Baskı: Apec- Tryck AB



Dara Mestê, belgefilmek li ser gundê Celîka

Wêneyê bergê:

Li gundê Xelîkê jêr, daweta Tahsin Kaya 1951, ji arşîva H. Hasan Tuzcu

Her nivîskar bersive nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re tèn,
serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan
nayên vegeandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

Naverok

- Ji bîrnebûnê 6
Alî Çiftçi
- Dara Mestê 7
Muzaffer Özgür
- Di dahatiyê da ji bo kurdênAlmanyayê
rêxistineke çawa? 9
Nuh Ateş
- Çîno (Hosteyê dizan) 19
Mem Xelîkan
- Kudên Stembola Nû 23
Rohat Alakom
- Sîyarê Têrika -9 31
Dr. Mikailî
- Pêkenî- Serhatî 43
Nuh Ateş
- Bêjenasiya peyva "kon"ê 45
Yalcin Polat
- Têbinîyek li ser "*Dîroka Kurdistanê
di çapemenîya swêdî de*" 51
Jordan
- 53 Kisse gewretit (Gotinên mezinan)
Smaylê Şêxbizeynî
- 54 Helbest
Seyfi Doğan
- 55 Reqa xaka kurd û Kurdistanê ye
Afrasiab Shekofteh
- 57 Dara hêvîyê
Xizan Şîlan
- 60 Demên borî
H. Hüseyin Deniz
- 69 Wêne
Seyfi Doğan
- 70 Xerîbîyê
Kemal Harimci
- 71 Mücadeleye adanmış bir ömür
Murat Bozlaş
Memduh Selim

Ji bîrnebûnê

Demsala payîzê ciwaniyeka pirrengî di xwazayî de peyda dike. Ev pirrengîya bi xwe re dewlemendiyeka din û tevgerêka nû dide jîyanê. Di vê demsalê de ji her aliyê jîyanê de jinû ve hazirî tên kirinê.

Payîz bi rengê xwe yê nû heveseka nû ya kar û xwendinê dide merîya. Bi despêka payîzê re di her warê jîyanê de guhartin û tiştên nûjen bi pêşengehên curbecûr tên nîşandan. Ji van pêşengehan yek jî wek hersal, îsal dîsan di meha payîza pêşîn de pêşengeha kitêban a navnetewî bû. Wek ku li piraniya welatên Ewropa tê kirin, li Swêdê jî li bajarê Göteborgê, bi şîyara "Azadiya derbirîna bîrûbaweriyê" di 22-25/09-2016an de pêk hat. Di hundurê van çar rojan de 96 293 kesî bejdarî kirin. 836 weşanxane bejdar bûn. Li gel semîner û gotûbêj 4190 program hatin dayîn.

Weşanxaneya Apecê jî bi semînera *Grania's Tears* (Hêstirên Graniayê) bejdarî kir. Semîner li ser "Ka çawa şerê Suriyê bandor li wêjeya kurdî kiriye ku pirtûkên zarokan yek ji qûrbaniyên yekem yê şer e." bibû babeta semînerê.

Dema meriv di hola semîneran re derbas dibû gelek cara rastî semînerdarên ku bahsa kurdan dikirin, dihat. Ji ber temaya îsal li ser azadiya bîrûbaweriyê bû piraniya semînerdaran giranî li ser pirkulturî û pirzimanî, şerê Suriyê, koçberî û nijadperistîya ku li Ewropayê pêşdikeve, deng dikirin.



Ji semînera *Grania's Tears* ji destê çepê ve moderator Anna Sjöstrand-Hedström, nivîskar E. A Nolan û vebêjê pirtûkê Soran İsmail

Li piraniya welatên Ewropa êdî herkes hemfikir e ku pirçandî û pirzimanî rastiyeka van welatana ye. Xerîbên li welatên Ewropayê jî divê li gor vê rastiyê xwe bi rêxistinî bikin dakû di reorganîzekirina nû de bikaribin kesayetî, çand û zimanê xwe biparêzin û pêşbixin.

Birêz Nuh Ateş bi sernivîsa *Di dahatiyê da ji bo kurdên Almanyayê rêxistineka çawa* bi çend destnîşanî pêşbînî ev rastîya civata kurdan a li Almanyayê di gotareka xwe ya li civîneka Komciwan a li Berlînê de dabû, ji ber aktualîya naverokê me di vê hejmarê de weşand.

Ev destnîşan û pêşbînîyên ku birêz Nuh Ateş di vê gotara xwe de pêşkeş dike ji bo hemû kurdên li welatên Ewropa derbas dibe.

Bi hêvîya ku ev gotara rê li ber diyalogê di navbera rêxistinên kurdan veke rojên xweş ên payîzê para we bin.

Ali Ciftci

Belgefîlmek li ser gundê Celîka



Muzaffer Özgür

Di derheqê gundê Celîka de belgefilmek kurt di medyaya civakî de hat weşandin. Belgefîlma *Dara Mestê* de çand, huner, dîrok û jiyana rojane ya gund tê mêrandin. Va belgefilma Adem Özgür û Hamo Celikan amadekir.

Ev salên dawî de li ser kurdên Anatoliya Navîn xebatên medyayê zêde dibin. Televizyon, rojname, kovar û medyaya civakê bala xwe didin kurdên Anatoliya Navîn û di derheqê wan de nûçe, bername û hevpeyvînan amade dikin. Yek ji wan xebatan jî belgefilma *Dara Mestê* ye. Dara Mestê di derheqê Gundê Celîka de hat kişandin û di

meha îlonê de li ser Youtubê hat weşandin.

Dara Mestê ku di destpêka gund de tê xuyakirin û ji xelkê gund va cîhekê taybet digire. Di belgefilma *Dara Mestê* de agahiya çand, huner, dîrok û jiyana gund ya rojanê; li ser kurdên Anatoliya Navîn û dîroka wan jî agahî hene. Ev kurte filma bi kurdî ye û 14 deqqe diajo.

Derhêner û senarîstî belgefilmê rojnameger Adem Özgür, çend sal in li ser xebatek veng difikirî û armanca xwe ya yekemîn anî şûnê. Adem Özgür, dixwast ku him li ser gundê xwe, bi taybetê jî dixwast di derheqê kurdên Anatoliya Navîn

de belgefilmek berfireh amade bike. Ji ber vê yekê belgefilma *Dara Mestê* bû xebatek yekemîn û ceribandin. Özgür diyar dike ku di belgefilma *Dara Mestê* de ji alî teknîkî, dîrokê û sînemayê de kemasî pir in; lê divê xebatên veng werin çêkirin.

Va belgefilma Adem Özgür û Hamo Celikan bi hev re amadekirin. Ji çend civîn, fikir û dengkirinan bi şûnda dest bi xebatên xwe kirin. Armanca wan ew e ku wê di demekê nêzik de belgefilmek dirêj, berfireh û tê de agahiyên dîroka kurdên Anatoliya Navîn xuya dibin amade bikin.



Adem Özgür û Hamo Celikan

Peyama zimên

Belgefilma *Dara Mestê* him di medyaya civakî de, him jî ji alî çapemeniyên kurdî de balkişand. Bi dehan kes ev belgefilma parvekir û bi hezaran kes ev belgefilma temaşekir. Di çend rojname, malperên nûçeya û televîzyonan de jî ev belgefilma danasîn. Di belgefilma *Dara Mestê* de hemû dengkirin, agahî û hevpeyvîn bi kurdî ne. Ji ber vê yekê film li ser zimanê kurdî peyamek dide. Bi taybetî jî zarokên vê gundê hê bi kurdî dengdikine û Adem Özgür dibêje ku “Armanca ne tenê belgefilm kişandin e. Me xwest ku em di vê belgefilmê de zarokên hê bi kurdî dengdikin bimêrin û bala wan zarokan bidin zimanê kurdî.”

Aliyê herî zêde ku balê dikişîne di vî belgefilmê de, bi giranî bikaranîna muzîka Rojava ye. Filmê ku xwerû serdanpê bi kurdî ye. Digel mûzîkê, axaftin û hevpeyvînên ku hatine kirin jî bi kurdî ne. Her wiha di saya hunermend Hamo Celikan de muzîkên belgefilmê balkêş bûn û bi piranî jî muzîkên modern hatin hilbijartin.

Film, him Youtube’ê de tê temaşekirin, him jî di rûpela *Celikan Postê* de.

Ev nivîsa li ser bingeha gotara ku min di kombûna, „Zukunftswerkstatt KOMKAR–KOMCÎWAN 2030, Berlînê 04–05.12.2015“ pêşkêşkiribû hatiye amedekrin.

Di dahatiyê da ji bo kurdên Almaniyayê rêxistineke çawa?

– Çend destnîşanî û pêşbînî –

Nuh Ateş

Rêxistin û sazîyên kurd û

Kurdistanî li welatên Ewropayê:

Ji bo lêgerîna li bersiva pîrsa, di dahatiyê (pêşerojê) da rêxistineke çawa ji bo kurdên Almaniyayê, gerek e em li rabirtîya (dîroka) rêxistinên kurd li Ewropayê û li hen taybetmendîyên wan yên sereke hûr û kûr binihêrin.

Kurd di sedsala bîstan da hatin welatên Ewropayê û li wir dest pê çêkirina sazî, dezgeh û rêxistinanan kirin. Di nivê pêşî yê sedsala bîstan da hejmara kurdên ku hatina Ewropayê kêmbû û pîranîya wan ji malbatên mezin û kurdperwer yên mîna malbata Bedirxanî û Cemilpaşazadayan bû û ji ber sedemên sîyasî û ji bo xwandina bilind hatibûn.

Yekemîn sazîya kurdan a bi taybetîyên netewî li dervayî welat, rojnameya Kurdistan ya kurdî-tirkî û panzdehrojî bû. Kurdistan ji ber

zext û astengîyên rejîma Abdulhamid, 22ê nîsana sala 1898an li paytexta Misir, Qehîreye hate weşandin. Ji hejmara 1an heta ya 6an li wir hate çapkirin. Paşê ji ber destdirêjîya dewleta osmanî xwedîyên wê mecbur man ku careke din şûn û warê rojnameyê biguherîn. Loma ji hejmara 6an heta ya 31an li Ewropayê, li bajarên wekî Cenewre, London û Folkistonê hate weşandin.⁽¹⁾

Di sala 1913an da komek (6 kes) rewşenbîr û xwandekarên kurd li bajarê Îswîçrê, Lozanê pîyê (liqê) rexistina Hêvî (Civata Talebeyî Kurd) çêkirin. Hêvî sala 1912an li paytexta Osmanîyan, Stembulê bo mafên kurdan û hînbûna kurdî hatibû damezirandin. Wekî rêxistinên din yên wê serdemê li Stembulê, di nav dameziranêrên wê da ji kurdên Diyarbekirê, Hekariyê, Su-

leymanîyê, Kerkukê û Mahabadê jî hebûn. Yanê Hêvî rêxistineke Kurdistanî bû, ne ya parçeyekî wê. Bi salixdana Ekrem Cemil Paşe, pîyên Hêvîyê li bajarê Cenevrê û Munîhê jî hatine çêkirin.⁽²⁾

Sala 1922an her du ziman û edebîyatnasên kurd, Kamuran Bedirxan û Celadet Bedirxan hatin Almanyayê. Celadet li Munihê hukuk xwand. Kamuran jî li bajarê Almanyayê, Leipzigê xwand û unvanê doktorîyê bi dest xist. Paşê, wî sala 1947an di zanîngeha Parisê da mostetîya dersên kurdî kir û di sala 1949an da sazîya bi navê Navenda Lêkolînên Kurdî çêkir.⁽³⁾

Bi pêşengîya rewşenbîr û xwendekarên Kurd li Ewropayê, di sala 1956an da li bajarê Almanyayê, Wiesbadenê Komeley Xwendekarên Kurd Le Ewropayê hate sazîkirin. Ev komaleya gelek salan bi navê wê yê îngilîzî, KSSE (Kurdish Students Society in Europe) di hate nasîn.

Meriv dikane bibêje, KSSE yekemîn komaleya kurd ya yekgirtî û li ser bîngeha nasnameya kurd û Kurdistanî li Ewropayê hatibû damezirandin, bû. Di bin bana wê da jî her parçeyên Kurdistanê xwandekar û akademîsyanan cih girtibûn.

Zimanê navxwe yê danûstandin, kar û xebatê kurdî bû. KSSE piştî sazûnê kovareke salane bi zimanê îngilîzî û bi kurdî ya bi navê *Hêvîya Welat* (1963–1965) derdixist.

KSSE her çû xurt bû û yên sosyalîst jî tevê li pir welatên Ewropayê pîyên wê hatibûn sazîkirin. Sala 1964an KSSE bû endama Yekîtîya Xwandekarên Navnetewî û beşdarî kombûn û festivalên navnetewî bû, nav û dengê kurd û Kurdistanê li dinyayê belav kir. Di destpêkê da 17 endamên KSSE hebûn û sala 1972an jimara endamên wê helkişî û bû 761.

Mixabin, KSSE bû qurbanê dijeyatî û nakokîyên navxwe. Cara pêşî sala 1965 birek kes ji KSSE veqetî û bi navê *Komeley Xwendekarên Kurd Le Ewropa* dest pê xebatê kir. Paşê, di pey peymanê Cezayirê ya sala 1975an va, gava şoreşa kurd li Başûrê Kurdistan şikest û tevgera kurd li wir parçe bû, KSSE careke din parçe bû. Bireke mezin jî endamên wê yên her çar parçeyên Kurdistanê jê veqetîya û sala 1976an AKSA (Yekîtîya Xwandekarên Kurdistan Li Dervayî Welat) hat damezirandin. Di sala 1978an da jî komek ji ber sedemên idolojîyê ji AKSAyê veqetîya. Pir neçû, bandora KSSE û

paşê ya yên ku ji wê veqetî jî her çû kêm bû û wext hat qet nema. Heyf e ku, li Ewropayê modela rêxistina yekgirtî ya li ser bingeha nasnameya kurd û Kurdîstanî têk çû.⁽⁴⁾

Û îro mixabin sazî û rêxistineke kurdan ya Kurdistanî û yekgirtî li Ewropayê, ji xeynî (heta derecekî) Federasyona komeleyên Kurdistanê li Swedê û Enstîtuya Kurd li Frensayê tune. Hevkarî û yekrêzîyeke mayînde di bin bana rêxistineke yekane da li Welatên din yên Ewropayê tune.

Li nivê paşî yê sedsala bîstan hejmara kurdan li Ewropayê sal bi sal, bi taybetî jî ji salan 1961 şûnda, xwasime bi girêdana di navbera Almanya û Tirkîyê ya ji bo koçdan û koçwergirtinê da û dûv ra piştî sitemkarîya hovane ya derbeya leşkerî li Tirkîyê ya sala 1980î, pir zêde bû. Û îro jî çî bi rêya zewacê û çî bi ya penaberîyê kurd tên welatên Ewropayê.

Ji salên 1970î şûnda tevgera kurd li bakûrê Kurdistanê û Tirkîyê, meriv dikane bibê, ji nûva destpêkir; bi dehan kom û partîyên nû derketin meydanê. Çend taybetmendiyên wan yên sereke ew bûn: Piraînya wan nehênî û çepgir û yanegirên sistemên sosyalist yên dema xwe bûn. Kêm û zêde ew ê di bin ban-

dora bîr û bawerîyên dogmatîk û otorîter da bûn. Di navbera wan da dijîhevbûneke tûj û hetanî asta birakûjîyê hebû. Çi li hember hev û çî li hember endamên xwe yên cuda-fikir, ew serhîşk, bê an kêmtahemul bûn. Bandora serokên wan pir zêde bû. Meriv dikane wan wekî partîyên serokan jî bi nav bike. Helbet gîşt ne yek bûn, ferq di navbera wan da hebûn. Hin ji wan li gor yên din nermtir bûn.

Ew serhîşkî û bêtehemulîya ideolojîya çep a dogmatîk û helwestên otorîter û eznavendîtîyê, di bin şertên dijwar yên wê demê da, çî li welêt û çî li dervayî welat dibû sebaba pevçûn, zîyan û hederkirinên potansiyalên insanî û madî yên giranbedel û dibû (û dibe) bend li pêşîya diyalog, hevkarî û yekrêzîya tevgera kurd.

Di salên 1960 û 70î da li Ewropayê pirtir li Almanyayê rêxistinên kurdên Bakûr yên nehênî (veşartî) wekî *Hevra* (1965/1971), *Bahoz* (1968), *Brusk* (1976) hatin avakirin. Û paşê her yeke wan komeleyên xwe yên aşkere wekî, KOMKAR, KK-DK, KOÇ-KAK, Feyka Kurdistan (1984-li ser xetê sîyasî yê PKK) çêkir. Meriv dikane bibêje, ku êdî serdema rêxistin û sazîyên parçeyî û girêdayî

partîyên sîyasî dest pê kiribû.

Piraniya rêxistinên kurdên koçber yê li Almanyayê di salên 70/80î da wekî piyê partî û rxistinên çepgir yê ji Kurdistanê bakûr bûn. Li piştî KOMKARê rêxistina nehênî/veşartî *Hevra* (Komele Şoreşvanên Kurdên Tirkîyê) hebû. Piraniya endamên *Hevra* di pêşî da akademîsyên û xwandekar bûn. Paşê, piştî damezirandina PSK di sala 1974an da, *Hevra* xwe belav kir û teve PSK bû.⁽⁵⁾

Armanca *Hevra* piştgiriya berxwedana milletê kurd ji bo rizgariya netewî û mafê wî yê çarenûstî bû. *Hevra* kovarek bi navê *Ronahî* derdixist û çend kîtabên li ser doza kurd û Kurdistanê û hen berhemen edebî weşandibû. Endamên *Hevra* di çekirina komeleyên karkeran kurd li Almanyayê di salên 1970 da yê ku paşê *Komkar* ava kiribûn aktiv bûn.

KOMKAR: Çend nimûne ji kar û xebatên di salên 70î û 80î da:

Bi hevkarî û beşdariya heşt komeleyên kurdên koçber û çend komîteyan roja 13.01.1979an li bajarê Frankfurtê KOMKAR-Federasyona Komeleyên Kurdistan hate damezirandin.

KOMKAR yekemîn federasyona kurdên koçber ên Kurdistanê Bakûr li Almanyayê bû. Wê sewa armancên xwe bi rê û rêbazên aştiyanê û demokratîk xebat dikir û dike. KOMKAR di kar û xebatên birêxistinî û komeletiyê yê nûjên ji bo tevgera kurdan a li Ewropa bû pêşeng, bû mînak û wê standardên nû danîn.

Armanc û daxwazên KOMKAR yê sereke meriv dikane li ser van xalan kom bike:

- Birêxistinîkirina koçber û xwendekarên kurd li Almanyayê û peşvabirina piştgiriya navberan.
- Nasîn û qebulkirina nasnameya kurd a etnîyî, kulturî û zimanî bi şêweyê resmî li Almanyayê.
- Kar û xebat ji bo piştgiriya berxwedana milletê kurd li dijî bindestîya neteweyî û bikaranîna mafê çarenûstî li her çar parçeyên Kurdistan.
- Peydakirina dost û piştgiran ji bo doza kurdan.
- Xebat ji bo mafên koçber û penaberan û li dijî neheqî û dijminatîya ku li wan tê kirin.
- Xebat ji bo aşî, biratî û hevnasîna gelan û belavkirin û nasandina

nêrînên sosyalîst.

- Di hundirê deh salan da, bi dehan komele û komitêyên nû çêbûn û tevlê Komkarê bûn. Hejmara endam û hezkirên Komkara êdî gihêştibû hezaran.

Pirozkirina cejna Newrozê:

KOMKARê her sal sewa xatirê pîrozkirina cejna Newrozê li bajarên Almanayê ên mezin, meresîm û şevşahiyên pîroziyê amede dikirin.

Pîrozkirina Newrozê bi girseyî û bi bernamêyên pir zimanî, rengîn û zengîn û beşdarîya kurdên ji her aliyê Kurdistanê û alman û biyanîyan di hate birêvabirin.

Di çar şevşahiyên navendî yên Newroza 1979an (Berlîna Rojava, Dortmund, Mannheim û Munîh) da, tevhev zêdetirî 4 hezaran kes beşdar bûbûn. 5 salan şûnda, di Newroza 1984an da deh hezar kes bedarî şevên Newrozê yên *Komkarê* yên navendî bûbûn. Ji 1984an şûnda hejmara beşdaran ji deh hezaran zêdetir bû.

Kar û xebata çap û weşangeriyê:

Qomkar xwedîya çapxaneyekê bû. Rojname û kovarên bi navê, *Dengê Qomkar*, *Roja Welat*, *Rîya Azadî* û *Qomkar-Înfô* û bi dehan kîtab

ên li ser mijarên sîyasî û li ser tarix, ziman û folklorê kurdî hatin çapkirin û belavkirin.

Nêzgrev:

Piştî derbeya leşkerî, KOMKAR roja 2ê mijdarê 1981an li hemberî sitemkarî, êşkence, kujtinên sîyasî ên rejîma generalan nêzgrevek bi rê xist. Nêzgreva ku 23 endamê Komkarê beşdar bûbûn 41 rojan ajotibû. Bang û hawara nêzgrevdaran deng da, li her derê belav bû. Raya giştî ya Almanayê û welatên Ewropayê hate haydarkirin. Tevgerê xurt ya piştgiriye pêk hat. Kurtebirî, nêzgrev bû çalakiyeke bi bandor û balkêşandî ji bo rûswa û şermezarkirina rejîma generalan.

Danasandin û naskirina nasnameya kurdî li Almanayê:

Almanayê demeke dirêj kurd nedinasîn û koçberên kurd bi salan ji maf û xizmetên wekî dersa zimanê kurdî, serbestiya navên kurdî, şewirmeniya sosyal û bernamêya radyoyê bi zimanê dê bêpar hiştin. Lê paşê û îro rewş û merc hatine guhêrtin.

Di sayê xebat û berxwedana rêxistinên kurdan yên salên 80î, bi taybetî kampanyayên KOMKARê

yên berferêh û carcar hevkarîya bi rêxistinên kurdan yê wekî KKDK û KOÇ-KAK va û bi piştgirîya dostên kurdan da, encamên berbiçav hatin bidestxistin. Bi bandora van hewl û xebatan û ya her du konferensên navnetewî li bajarê Bremen (1989an) û li Bonnê (1991an) ji bo „Mafên Meriva li Kurdistanê“ bi piştgirîyeke xurt ya Komkarê, Almanayê sîyaseta xwe guhêrî. Di biryara parlemana Almanayê ya sala 1991an û bi erêkirina gişt fraksiyonên wê da, qala pêwîstiya qebûlkirina mafên kurdan li welatên ku ew lê dijîn û peydakirina îmkanên ku kurd pê bikanin li Almanayê nasnameya xwe ya kulturî biparêzin, tê kirin. Ji wê şûnda, bend û astengiyên li ber navên kurdî rabûn û rê li ber dersa kurdî ji bo şagirtên kurd vebû. Ji hîngê vir da li çar eyaletan, Bremen (1993), Hamburg (1994), Niedersachsen (1995), NRW–Nordrhein Westfalen (1997) dersa zimanê kurdî heye.⁽⁶⁾

Dijwarî û zehmetiyên wê Demê:

- Bêtecrubetîya derbarê birêxistin-kirinê ya li dervayî welat û xwesima di derheqa kar û mijarên burokratik û birêvabirinê da. Her weha kêmhaybûna ji ziman, kultur û diroka kurdan.

- Zehmetî û tengîyên ji ber bihevgirêdana karê rêxistinî yê aşkere bi yê veşartî va.
- Parçebûn û ji hev veqetîyên ji ber sebebên sîyasî û idologî da.
- Cihîştina giraniya berpirsariyê, kar û xebatê bi ser Komîteya Birêvabirinê ya Gîştî da.
- Îhmalkirina zimanê kurdî di civîn û kongre û kombûnan da.

DÎ DAHATÎYÊ DA JI BO KURDÊN ALMANYAYÊ RÊXÎSTÎNEKE ÇAWA?

Divê meriv kurdên li Ewropayê yan yê Almanayê, ji ber ku mijara me ew e, çawa tarîf û rave bike û bide nasandin? Ma kurd li Almanayê kî yan çî ne?

–Li gorê tehmînên di hen jêder û çavkanîyan da, îro qasî mîlyonekî kurd li Ewropayê dijîn. Ji wan 600.000 li Almanya û ji wan jî 200.000–250.000 li Eyaleta Nordrhein Westfalyayê û 50.000 li Berlînê bi cîh û war in. Ji kurdên li Almanayê 500.000 bi eslê xwe kurdên Kurdistana Bakûr û Tirkîyê ne û yê mayî yanê 100.000 ji parçeyên din ên Kurdistanê û ji Anatoliya Navîn û welatên Sowjeta berê ne.

–Bi qiyaskirina bi komên koçberên din va, meyîla kurdên Al-

manyayê, ji ber sitemkarî, xizanî û dijwarîyên din yê li welatên wan, zêdetir berbi mayîndebûnê, entegrebûnê û hemwelatîbûna Almanayayê ye û şans û îmkânên vegeza wan a welatê xwe kêmtir e. Kurdên Almanayayê birek ji civata Almanya ye. Almanya bixwe zûva ye bûye civateke koçwergir û pirkulturî. Ji her penc kesên li Almanayayê yek bi rabirtîya xwe koçber e.

–Di ser koçberîya kurdan ya berve welatên Ewropayê niv esir derbas bûye. Di vê niv esirê da, guhêrtinên giring û berçav çê bûn. Di destpêkê da piraniya kurdên Almanya û yê welatên Ewropayê din jî karkerên koçber bûn. Ji wan birek jî xwendekar û penaber bû û xeyala wan gîştan jî şûnda vegeza welat bû.

–Lê niha kurd li Almanayayê bûne komeke mezin, bûne civateke bi serî xwe, rengîn û piralî. Ew êdî ne tenê ji karker, xwendekar û penaberan, her weha ji malbatên bi zar û zêç, ji ciwanan, ji nivşên duyem û sêyem, ji kal û pîran, ji malnişînan (tekewudan), ji karsaz, bazirgan, dikandar û ji kesên bi meslek û hunerên pircure pêk tên.

–Mixabin heta niha lêkolînên

akademik û rapirsînên berferêh û rêk û pêk li ser civata kurdên Almanayayê bi giştî û bi taybetî li ser kurdîzanî û kurdînezaniya wê tunin û yê heyî jî ji ber tunebûna statîstîkên zêlal bi kêmanî ne. Nimûne ji 600.000 kurdên Almanayayê çiqas kurdîzan û kurdînezan in û rêjaya kurdîzan û kurdînezanan di nav nivşên yekem, duyem û sêyem da çiqas e? Û ji destpêka salan 90î vir da çiqas şagirtên kurd ji imkana dersa kurdî ya li eyaletên navborî istifade kirine? Ji endamên rêxistinên kurdan çiqas kurdîzan in û rêxistinên kurda çiqas di civîn û kongreyên xwe da kurdî bi kar tînin... Mixabin em bersiva van pirs û mijaran bi awayekî zelal nizanin. Ji bo vê pêdivî bi lêkolîn û rapirsînên berferêh û rêkûpêk heye.

Tenê meriv dikane qala van meyl û trendan bike: Yê ku ji berê da (gava nû hatin) kurdî nezan û kurdîzan û yê kurdî li Almanayayê hîn bûyî kurdî û yê ku kurdî li Almanayayê ji bîr kirî hene.

Kurdnasê alman Meyer-Ingwersen hejmara şagirtên kurd yê di çaxê dibistanê ra, di sala 1995an da, wekî 130.000î heldide. Ji vana bi tehmînî 40.000 yan 50.000 li eyaleta

NRWyê ne. Li gor çavkanîyeke devkî hejmara şagirtên kurd yê ku sala 2014an da beşdarî dersa kurdî ya li dibistanên vê eyaletê bûne mixabin tenê 470 ye.

Li Eyaletên Bremen, dersala 1998/99, Hamburg 1997/98 û Niedersachsene 1997/98 tehev tenê 915 şagirtên kurd beşdarî dersa zimanê kurdî bûne. Di heman derssalê da hejmara beşdarên dersa tirkî li van her sê eylatan 200.000 e. Tûnebûna îmkana dersa kurdî li dibistanên eyaletên wekî Hessen, Baden Württemberg Bayern û li Berlîne ya ku lê vîqasî 50 hezar kurd bi cîhûwar in kêmanî û bêbextîyeke mezin e.

—Her çiqas xebat û hewldanên heja ji bo parastin û pêşvabirina zimanê kurdî li Almaniyayê hebin jî, gava meriv li van hejmaran li jor û li derdora xwe dinihêrê û bikarnameyî ya yan kêmanîyî kurdî di cîvîn, kongre û konferansên rêxistinên kurdên Bakûr û Tirkîyeyî da dibîne, hîngê ew digihêje wê qenatê ku zimanê kurdî li Almaniyayê jî di metirsîya ji nav çûyîne da ye.⁽⁷⁾

—Kurd êdî li Almaniyayê civateke mayînde û parek ji civata Almanya ye. Her çiqas ku ji nav kurdên Almaniyayê kes û komên ku vedigerin

welat û yê nû tîn Almaniyayê tim hebin jî, piranîya wan ên mayînde bimînin. Ji ber vê jî gerek e ku ev guhertin û taybetmendiyên kurdên Almaniyayê, bi minesebeta lêgerîna bersiva pîrsa rêxistineke çawa di dahatîyê da ji bo kurdên Almaniyayê û ji bo nav û armancên wê, li ber çavan bê girtin.

—Kurdên Almaniyayê divê êdî Almaniyayê wekî welatê xwe yê yekem yan duyem bibînin û xwe jî mîna alman yan hemwelatîyê Almaniyayê ên kurdnijad bizanin û binasînin. Ne tenê civata Almaniyayê, koçber jî teve, bi gîştî yeke pîrzimanî, pîrkulturî û pîr nasnameyî ye. Kurdên Almaniyayê jî wekî pareke wê civatê, di nava xwe da jî pîrzimanî, pîrdînî (Musliman, Ehli/Rêya Heq, Êzidî,...) û pîrwelatî ango pîrnasnameyî ne. Nasnameya wan elementên nasnameya tirkî, farisî, erebî û bi taybetî ya almanî jî dihewîne.

—Loma gerek e ku nav û armancên rêxistina kurdên Almaniyayê ya pêşerojê li gor van rastîyan be. Divê ew serbixwe û serpartî be û girêdayî tu partiyên sîyasî yê kurd û alman nebe. Rêxistina kurdên Almaniyayê a dahatîyê divê berî her tiştî bibe daxwazkar û parazvanê hewcedarî û berjewendîyên kurdên Almaniyayê

yên sosyal, kulturî û dinî–ayînî. Yek armanca wê a sereke û bingehîn jî divê peydakirina derfetên ji bo parastina nasnameya kurdan, bi taybetî aliyê wê yê kurdî li ser binateya ziman, edebiyat, kultur û dîroka kurdan be. Û berî her tiştî gerek e ku ew ji bo peydakirina derfetên hînbûna zimanê kurdî yê ku li Almanyayê jî di metirsîya ji nav çûyîne da ye, bixebite. Û ji bo vê li ser xwe bike ferz ku endamên xwe hînî zimanê kurdî bike û zimanê kurdî di civîn û kongreyên xwe da bi kar bîne. Her weha divê ew bibe piştevanê hewl û berxwedanên xelkê kurd li her çar parçeyên Kurdistanê ji bo bidestxistina mafê çarenûsî.

–Divê kurdên Almanyayê sewa wekhevî û edlâyîyê û dijî her cure nijadperestîyê teve kar û xebatên civatî, sosyal û siyasî li Almanyaya bibin û di partî, sazî û rêxistinên sîvîl û civakî da jî cih bigrin. Û hîngê, li vir cihê gotinê ye, kurdên Almanyayê dê bikanin hîn baştir piştbazîya xelkê kurd û tevgera wî ya azadixwaz ji bo mafê çarenûsî jî bikin û hêsantir derfetan ji bo xizmetên sosyal, kulturî, olî û ayînî jî li gor pêdivîyên kurdên Almanyayê peyda bikin.

–Li Almanyayê û welatên din yên

Ewropayê derfete heye ku yekîtiya kurdan ji her parçeyên Kurdistanê û herêm û warên din ên kurdnişîn pêk bê, eger sinorên sîyasî û ideologî û hizbî nebin bend. Bêgûman yekîtiya wan di rêxistineke yekgirtî da, dikane bandoreke erênî li ser tevayîya tevgera kurd li Kurdistanê jî bike.

–Lê rastîya niha ew e ku kurdên Almanyayê xwediyê bi dehan rêxistinên cûr bi cûr in yên ku kêma û zêde li ser bingeha cûdayîyên idologî, sîyasî û olî çêbûne. Mixabin, ji ber giredayîya bi partiyên sîyasî, cudahî û nakokîyên navxweyî ew ne di bin banekê da ne jî. Li gor çavkanîyan, di sala 1990î da 230 sazî, dezgeh û rêxistinên kurd li Ewropayê hebûn. Sala 1997an li Almanyayê 150 rêxistin, sazî dehgehe kurd hebûn. Kî dizane belkî îro hejmara wan hîn zêde bûye. Tenê li Berlîne bi tehmîn ji 30î zêdetir rêxistin, sazî û dezgehên kurd hene. Ma evqas rêxistin û birûbelavbûnî nîşana xêr û bereketê ye? Na xêr, ev zîyan e û rewayî wê ye ku wekî rûreşî bê binavkirin.⁽⁸⁾

–Pêwîst e rêxistina kurd ya yekgirtî li ser bingeha sazîya eyaletî/federalî bê danîn. Li her bajarekî Almanyayê ku têr kurd lê dijîn divê rêxistineke kurdan a yekgirtî li ser navê „Warê Kurdan*“ yan „Kome-

leya Kurdan“ hebe û Warên Kurdan yên li her eyaletê di bin bana „Girêdanka Warên Kurdan li Eyaleta“ û li giştî Almanayê jî ew di bin bana „Yekîtiya Warên Kurdan Li Almanya“ bi hev va bên girêdan. Divê Warên Kurdan xwediyê wargehan (mal/xanî) bin. Di wargehan da divê holên konferens û kombûnan, dersxane, kîtapxane û cihên ji bo hewceyîyên olî/ayînî ji bo kurdên musulman, êzîdî, ehli/rêya heq/elewî hebin.

–Rêxistineke yekgirtî tê wê wateyê ku kurd li Almanayê û rêxistin

û sazîyên wan hemd û hêz, hizr û hûnera xwe bikin yek, da ku bibin komeke bi giranî û bi bandor ji bo bidestxistina heq û derfetan.

–Divê meriv li ser mijara çawabûna rêxistina ji bo kurdên Almanayê di nav xwe da û bi rêxistinên kurd ên din va bikeve nav diyalog û danûstandinan û dest bi proseyeke ji bo dahatîya kurdên Almanayê û yekgirtîya rêxistinên wan birêva bibe. Ji bo vê, gerek e ku meriv ji tecrubeyên miletên din yê berî me hatina dîsporayê û ji tecrubeyên kurdên Swedê jî istifade bike.

- (1) Mehmet Bayrak, Kürt Sorunu ve Demokratik Çözüm, ÖzGe yayinlari, şubat 1999, rûpel 398–400; Mal-misanij, Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet, Jina Nu, 1986, Upsala, r. 14–17; A. Balı Han, ji du heya iro Bedir Han Paşa û malbeta Bedirxanî, 03.03.2012, malpera Dengê Kurdistan; Mehmet Şahin/ Ralf Kaufeldt, Daten und Fakten zu Kurden und Kurdistan, Pro Humanite, 2002, rûp.228–229.
- (2) Kadri Cemil Paşa, Doza Kurdistan, ÖzGe yayinlari, rûpel. 34/35; Ekrem Cemil Paşe, Muhtasar Hayatim, Brüksel Kürt Enstitüsü 1991, rûpel 23.
- (3) Birgit Amman, Kurdoloji 4, 2001, rûpel 119.
- (4) Rohat Alakom, Kurd ketin defteran–Pencisaliya sazûna KSSEyê, 2006, Malpera Nefel; Birgit Amman, Kurdologie 4, rûpel 119–120; Dengê Komkar, sal 3, hejma 32, 1981; Memo Şahin, Kurdên Almanayê, 2013, rûpel 72.
- (5) Birgit Amman, Kurdologie 4 rûpel 156; Kemal Burkay Anilar, Belgeler, cilt 1, rûpel 376–379.
- (6) Dengê Komkar, cilt 1–2 KOMKAR 9.10.11.12. Kongre Raporlari yazisi; Kemal Burkay Anilar cilt 2 rûpel 134; Nuh Ates Ehmedê Elê– Jînenîgeriya koçberê kurd li Almanya 2014, rûpel 101–109 û 124–150; Bagiv : Memorandum zum muttersprachlichen Unterricht 1985; Mehmet Şahin / Ralf Kaufeldt, Daten und Fakten zu Kurden und Kurdistan, eine Chronologie 2002, rûpel 316–317; Kovara Roja Nû „Konferansa Navnetewî ya mafên mirovatî li Kurdistanê pêkhat“ Hejmar 24 sal 1989; Sabine Skubsch, kurdische Migrantinnen und Migrantenim Einwanderungsland Deutschland –Disertation–2000, Kapitel 6, Seite 150–198 in : duepubliko–uni duisburg–essen.de.
- (7) Birgit Amman, Kurden in Ewropa, Kurdologie 4, rûpel 137–146 û 377–380; Memo Şahin/ Ralf Kaufeldt, Daten und Fakten zu Kurden und Kurdistan–eine Chronologie 2002, Seite 138–149, 288–309; Kurden im Exil, Berliner Institut für vergleichende Forschung 1991, Edition Parabolis, kapitel 2.1.3.; Sabine Skubsch, kurdische Migrantinnen und Migrantenim Einwanderungsland Deutschland –Disertation–2000, Kapitel 6, S. 150–198 in duepubliko–uni duisburg–essen.de.
- (8) Memo Şahin, Çîroka Koçberên Bêparêzer–Kurdên Almanayê 2013, Ankara, rûpel 17–21 û 220–229; Birgit Amman, Kurdologie 4, rûpel 156–164.

*War: *cih, ocax, welat; bi almanî: Heim, Haus, Wohnstätte*

Nuh Ates

E–Mail : nuhates@web.de

ÇÎNO


(Hosteyê dizan)

Mem Xelîkan

Mustafa Kurnaz, lawê Simê Mihe-med û Têla Hecî Ekîz e. Li bajaroka Kulu li gundê Cêlikan (Kırkpınar) bi cih û war bûn. Di 14 salîya xwe de bavê vî dimire, bê-bav, sêwî dimê. Ji bo wê jî, bêkes û serbest mezin dibe. Wê demê, meriv di tuneyîyê de wûn. Jîyan bi qar û bar wû. Mal û malbat bixwedîkirin zehmet û zor wû. Ji bo wê, dizi kirin zêde wû. Çîno (Mistefa), bi wî karî, karê diziyê bi nav û deng wû. Bûyî bû, hosteyê diziyê. Ji bo ku, bi her çînekî dizanî ew nava dayîbûn ser.

Çîno, meriyekî cêmer û bêtirs bû. Derên meriv bi ro bitirse nedîçûyî, Çîno bêtirs bi şev diçûye. Li diziyên dikirî, xwe nedidaye dest. Bi jîyana xwe ya rengîn, bi karê diziyê li heremê, li gundên der dorê deng daye. Li heremê, bi şev zarok bi navê vî ditirsandine û dikirine xewê.

Çîno, wek kowboyekî wû ye. Ji hespa hezdkirîyê û wek sîwarekî hoste, hesp diajotiye. Li çiya tu hespê ku nedigirtî tûnewûne. Wek



kowboyekî kemend diavitîye. Li piştê hespê xwe, di rojekê de li çar bajarokê heremê (Kulu, Cihanbeyli, Haymana, Bala) digerîyaye. Çîno, wek mafyayê wê demê wû. Li heremê, kî diziyê dike?. Çi di-dize? Li kêderê vedişêre Çînoyê me ji giştika agahdar wû ye. Li heremê, li kîjan gundî, li kêderê kê çî dizi kiriye, çî hatiye dizandin; pez, mange an jî tiştêkî din hatiye dizîn, mala vî hatiye derva kirin, dihatine ji Çîno alîkarî dixwastine. Çîno jî, ku bi xwe nediziye diçûye, ew tiştê



hatiye dizîn, ji dizan didizîye û daye xwedîya. Qereqolê bajarokan jî, dema li diza digerin cara pêşîn dihatine ji Çîno alîkarî dixwastine. Femandarên qereqolan dihatine cem vî, "Mistefa, li felan gundî, vîkas berx, çend hesp, mange hatine dizîne. Here ji me re bîne." digotîne. Vî jî digotîye: "Li ser serî" Mîna ku bi destên xwe ew tiştê dizîye, bi şûn kiriwe, didîtiye û tînaye.

Çîno li serê çîyayê nêsîkî gund, maleke vî hebûye. Li wir ratiketîye û dijîyaye. Erdê li dor alîyê mala xwe, dirişandî û diçîniye. Li wir cotgarî dikiriye. Gundî, hê ji wê derê re dibên "Dûzê Çîno". Niha jî, ez ji we re çend çîn û diziyên Çîno yên me bihîstî qalê bikim.

Rojekê Çîno, di kêleka bostanekî re derbas dibe. Mêsdikeyê, şivanekî

kulavê xwe, kulavekî ecer bi serê çoyê xwe ve kiriye, bin sîya vî ramediye. Bidivîyê wî jî hebûye ku bi şev tê da rakeve. Dixwaze, kulêv bidize. Difikire, ez ê çîng şivên şîyarnekim, xewle bikim ku kulêv bidizim. Ji hespê xwe peya dibe. Hêdî hêdî nêzîke şivên dibe. Kulavê şivên, bi benekî dirêj girê dide. Ben di dest de, li hespê sîvar dibe û dema bi lez hespê dimeşîne kulav li hewa di dûv vî berba dibe. Şivan, şîyar dibe lê ji toz û dûman Çîno ji wî ve xûya nake, tenê kulavê xwe li hewa dibîne ku berba dibê. Şivan dihere gund, ji gundîyan re dibê, "Ez raketî bûm, rabûm balefirekê (teyare) kulavê min bi baska wê de li hewa difirê."

Rojekê Çîno, mîna herro li ser hespê xwe li deştê raste kerîyek

pezî ku şivan li ber, tê. Mîyeke çê, mîya bizbendê bala vî dikişîne û di here cem şivên. Wê mîye dixwaze. Şivanê me, çeka vî li navê, kûçikên kerî yên no jî hene. Bawerîya xwe bi xwe heye. Çîno azar dike û mîyê nade wî. Çîno, ji kêrî bi dûr dikeve û ji dûredûr ve, vî dişopîne. Dema şivan kerîye xwe, dibe devê newalekê de mexel dike, Çîno xwe tazî dike (Bi gotina Çîno, kûçik nayên meriyên tazî), hêdî hêdî di here cem şivên. Çeka vî ji navê dike û mîyê digire bi dûr dikeve. Şivan dema bi xwe dihêse, ji xew radibe, dibîne çeka xwe û ew mîya Çîno xwastî tune. Dizane ew Çîno birin. Di here cem Çîno, dibêje "Bra, mî ya te be, lê çeka min bide min." Çîno jî, dexwaza wî tîne şûnê.

Xwendevanên delal, ve dît ez ji we re qala rêberekî gel an jî egît û cêmerekî nakime. Qala meriyekî bi çîn û çirtikên xwe, bi diziyên kirî deng dayî û bi jîyanekê cûda navdar dikime. Çînoyê me, bi kirinên xwe wîkas navdar wû, dûw ve her gundekî doralîyên me Çînoyekî xwe hewû. Lê ew Çînona yên bi wî nav kirine. Çînoyê heq, Çînoyê Cêlikî (Kirkpînarê) ye.

Cîranekî Çîno qal kir. Got: "Rojekê çûm ber mala Çîno, gun-



dî berhevbûne. Çîno, çavên kerekî girêdane. Kerî berdaye ser mehînekê. Gundî jî, bi mereq temaşe dikine. Dema ku mehîna Çîno za û qantirek anî dinê, me fehm kir Çîno wê demê ketîye dûv çî."

Rojekê dîsa, Çîno diçûye gundekî cîran seredana meriyên xwe. Bi rê de, raste mangekê hatî ye. Mangê benek bi stû de diçêrîya ye. Çîno, mange girtiye û benê wê yê bi pi de bi rê ya xwe de diçûye, raste gundîyekî hatiye. Gundî pirsîye:

– Diherî kêderî

– Di mal de, tişteki zarok bixwin nema. Dixwazim herim vî gundî li hember. Manga xwe bifiroşim, dibê Çîno.

Gundî dixwaze mangê bistîne. Çînoyê me jî, mangê bi perene pîrr difiroşe û di here gundê ku here. Mêzedike, mala çûyî bi xwe de ketine. Manga wana wenda bûye. Malbat, di telaşa manga ku wenda bûyî de ne. Jê re dibêje "Xwe meêşînin, mereq nekin ezê bigerim manga we bibînim û ji we re bî-



nim." dibê. Du rojan şûva jî, şevokê mangê tîne ber malê girê dide û dihere.

Li gor katkirina gundîyên Çîno, ne meriyekî bê maf (bêheq) wû ye. Dibêjin: "Diz wû, bi heş wû, lê neyî bêmaf (bêheq) wû. Deynên xwe didan. Heqê kesî nedixwar. (Ji xeyrî diziye !!!). Lê, Çînoyên huro, yên ku navê vî girtin pirranîyên wanan bêheq in, deynên xwe nadin."

Demekê Çîno, dixwaze maleka xwe çêke. Ji bo wê dihere Qulekê (Kulu) ku dar û bernî bistî ne. Dihere dera ku ew dar-bera dihatî firotinê. Esnafê ku navê Çîno bîhis-

tî, naxwaze tişteki bide vî. Çîno bi qîr û bar "Bulgurcu, ez î diz im. Ez, neyî bê ol û bê heq im." dibêje. Bi ser wê de tişte ku dixwaze digire û tîne. Deynê xwe jî, di ber herkesî tîne û dide Bulgurcu.

Rojekê Çîno dihere Qamanê (Bajarokê Qişêrê). Dihere gundê fiseka. Li ber malê, jineka belengaz di tuneyîye de dibîne. Wê jinikê, nav û dengê Çîno bihîstîye. Jê re gotîye; "Mistefa, ez qûrban, xwedîyê mala min mir. Ez, bi serê xwe nîkarime zarokên xwe xwedî bikim. Di mal de tişteki bidim zarokan nema. Em birçînî. Ez, alîkarîya te dixwazim."

Çîno, tu bersîva nade wê û ji wir bi dûr dikeve. Çend rojan şûva Çîno, li piştê pênc hespa ard, sewar (bulgur), ce û genim, çay, şeker barkirî tê ber malê. Ew tiştê anî, dide jinikê û dûr dikeve.

Bi tesbîtên me, li 105 gundên doralî me Çîno hene. Ewana giştikan, navê Çînoyê Cêlikî pêda kirine.

Dizê me yî hoste va ye!.. Çînoyê Cêlikî ye.

*** Li amadekirina vê nîvisê, ji bo alîkarî ya mamoste Hizir Akbîna spas dikim.

Di romaneke Orhan Pamuk de
Kurdên Stembola Nû

Rohat Alakom



Firoşkarên gerok li Stembolê

Yek ji wan romanên Orhan Pamuk ku di van salên dawîn de derketiye û bala min kişandiye, romana bi navê *Di serê min de ecêbiyek* e.¹ Di destpêkê û dawîya romanê de cîhgirtina şecereya malbatên ku navên wan di romanê derbas dibin, îndeksa endamên van malbatan û kronoliya van 50 salan bi rastî alîkarîyeke mezin dide xwendevanên ku dixwazin bi baldarî rêzebûyerên romanê ji hev derxin û bişopînin. Galeriya kesan

1 Orhan Pamuk, *Kafamda Bir Tuhaftık*, YKY, 2014.

di romanê de dewlemend û rengîn. Di romanê de zêdedtir təkiliyên sê malbatên ku ji Beyşehirê (qezayeke bajarê Qonyayê) koçberî Stembolê kirine, hene. Herdu bira Hesen û Mistefa di sala 1963an de koçberî Stembolê dikin, zarokên wan li Stembolê mezin dibin. Lehengê romanê Mevlut kurê Mistefê ye, di sala 1957an de hatiye dinê, di sala 1969an de koçberî Stembolê kiriye û hemû jîyana xwe ya mayî li Stembolê derbas dike. Lawên van herdu malbatan dibin evîndarê hersê keçên (Vediha, Samiha, Rayiha) kesekî bi navê Evdilrehman Efendî. Mirov bi kurtî dika-re bêje ku romana *Di serê min de ecêbiyek* romana van hersê malbatan e. Keça ku dilê xortan zêdetir diperitîne û hiş di serê wan de nahêle Samiha ye. Gelek xortan li pey xwe digerîne. Mevlut, Silêman û Ferhat dibin evîndarê wê, heryek bi awayekî nêzî vê keça xortxapînok dibe. Di dawiyê de ew û Ferhat gotinên xwe dikin yek, ji Ferhat re direve. Piştî salan Ferhat dimire, vê carê Samiha diçe dighêje Mevlut –mêrebîyê ku berî salan bûye evîndarê wê.

Lehengê romanê yê sereke kesekî bi navê Mevlut e ku bi salan li Stembolê wek firoşkarekî gerok kar kiriye. Mevlut di dîlanekê de ji du xweşikên xweşîka piçûk û xweşik Samihayê dibîne û di carekê de dibe evîndarê wê. Nêrinên wê yên wek tîran di hişê Mevlut de cîh digrin. Dema diçe leşkeriyê nameyên xwe ya mezin Rayiha re dişîne. Lê belê di eslê xwe de Samihayê difikire! Kuzenî wî Silêman bi zanetî (bi xeletî) dêvla Samihayê, navê dilketiya wî wek Rayiha jê re gotiye. Wisa xuya dibe dilê Silêman jî di Samihayê de hebûye. Orhan Pamuk bi rastî nigê Mevlut dike sole-ke teng. Dema Mevlut ji leşkeriyê tê, dilketiya xwe bi alîkariya Silêman êvarekê direvîne, dibîne ku ew keçîka ku revandiye ne ew keçîka ku di dîlanê cara pêşîn dîtîtibû û bibû evîndarê wê. Mevlut di destpêkê de ge-lek ber xwe dikeve. Lê belê tiştêkî bike jî tune ye. Dîlana xwe dikin, bi salan ligel hev wek mêr û jin dilşa dijîn. Piştî salan jina wî Rayiha dema zaranîne ji ber zêde xwîn wînda dike, can dide. Xwîşka ku dilê Mevlut berî salan ketibûyê ji kurdekî bi navê Ferhat re (hevalekî Mevlut) re di-reve. Piştî salan hin çete Ferhat dikujin, jina wî Samiha jinebî dimîne. Di dawiya romanê de Mevlut vê carê bi Samihayê re dizewice (dilketiya wî ya pêşîn). Bûyerên ku di romana Orhan Pamuk de hene zêdedir li ser


macerayên vî kesê sade û belengaz Mevlut re derbas dibin. Mevlut hemû jîyana xwe di kuçe û kolanên Stembolê bi firotana *boza* û mast derbas dike. Boza vexwarinek e ku ji hevîrê meyakirî yê zad tê çêkirin.

Roman nîv sedsaliya dawî ya bajarê Stembolê jî tîne zimîn. Berhemeke nîv-dîrok jî dikare bê hesibîn. Roman dîroka Stembolê ku di nav van salan de bûye mega-bajar, wek miknatîsekê bi mîlyonan mirov berbi xwe kişandiye dide nasîn. Beşeke van koçberan jî kurd pêk tînin. Ev kurdên ku hatine Stembolê ji her derê Kurdistanê, ji her dever û bajaran koç kirine. Dîroka kurdên Stembola kevn heta berî sedsalan dirêj dibe.¹ Dîroka kurdên Stembola nû, kurdên ku piştî salên 1960î hatine Stembolê bi serê xwe hêjayî lêkolîneke din e. Ev romana Orhan Pamuk bona ronîkirina wêneyê jiyana kurdên Stembola nû alîkarî û rêberiya me dike. Kurdên Orhan Pamuk zêdetir ji ber şer û zordestiyên polîtîk revîne, hatine li Stembolê cîwar bûne. Bi taybetî şerê ku di navbera kurdan û ordiya tirk de di salên 1980yî de dest pê dike û heta rojên me berdewam dike wan herêmên ku kurd lê dimînin dike dogeh (cehenem). Kurdên ku bêgav û bêçare mane berê xwe didin bajarên mezin wek Stembolê. Lê belê ji kurdan re li Stembolê jî rehetî tune. Ji ber vî şerê kurdan li Stembolê jî carcar bombe diteqin, lê belê Taksîm dîsa jî tijî mirov in (rûp. 317). Çavekî polês û hêzên îstîhbaratê hertim li ser kurdan e. Wek mînak dema bombeyek di pastexaneyek li ber Otêla Marmarayê diteqe, polês pêşiyê oldarên fanatîk suçdar dike, roja din kurdan hedef nîşan dide (rûp.321). Nûçeyên ji Kurdistanê li ser hev tîne Stembolê, wek mînak dema mirov televîzyonên xwe vedikin dibihîsin ku îsyankarên kurd li hêla Çolemerkê leşker kuştine (rûp.257). Di van salan de wisa xuya dibe kesekî kurd yan ji komeke din li Stembolê cûret nekiriye li peyva kurd û nasnameya kurd xweyî derkeve. Wek mînak dema carekê şagirtek qirfê xwe bi zarav û kincên zarokekî kurd dike, di nav hevokê de vê agahiyê cîh girtiye: “*Wê demê tu kesekî nikaribû peyva kurd bi kar bîne*” (rûp.76).

Orhan Pamuk lehengê xwe Mevlut bona leşkeriyê pêşiyê dişîne bajarê Burdurê, paşê wî dişîne bajarê Qersê ku gelek kurd lê dimînin. Mevlut

1 Rohat Alakom, *Eski İstanbul Kürtleri*, Avesta, 2011.

havîna sala 1980an de tê Qersê û payîza eynî salê jî darbeya leşkerî roja 12/9 1980yî de li Tirkîyê çêdibe. Serekê Şaredariya Qersê diguhire kesekî leşker Turgut Paşa tê ser vî karî. Mevlut li Qersê dibe şahidê gelek bûyerên sîyasî jî. Çawa tê zanîn bajarê Qersê di romana nivîskar a bi navê *Berf* (Kar) de jî heye.¹ Dema Mevlut diçe Qersê, dibîne ku ev devera deve-reke gelek sar û gelek xizan û belengaz e, li ser dîwarên avahiyan zêdetir slogan û nivîsên hezên polîtîk yê çep hene. Nifûsê wê qasî 50 hezaran



bûye. Mevlut ji Qersê gelek nameyan ji dilketiya xwe Rayihayê re dişîne. Çavên wê dişibîne “Çîyayên Qersê” yê bi keder û xembar, di nameyeke din de van çavan wek nêrgizan dide nasîn, çavên ku di dîlana Korkut de hişê Mevlut ji serê wî biribû. Leşkeriya wî angorî Burdurê, li Qersê baştir derbas dibe. Di romanê de tê gotin ku dema mirov li leşkeriyê ji dilketiya xwe re nameyan dişîne wext gelek zû derbas dibe. Mevlut 16 mehan li Qersê dimîne. Di mehên dawîn de qasî 47 nameyan ji Rayihayê re dişîne.

Bergê romanê

Mevlut dema beşa yekem a leşkeriya xwe li bajarê Burdurê kiriye, bûyereke ku bûye şahid qet ji ber çavên wî naçe. Serbazek rojekê wisa zordestî û ezîyetên mezin li leşkerekî Dîyarbekirî dike, ev rebenê kurd di nezeretê de bi kemera xwe, xwe darda dike û dîkuje. Li vî romanê de tê gotin ku bikaranîna peyva kurd di leşkeriyê de qedexe ye (rûp.156).

Di nav dorberên Mevlut gelek kesê hene ku bi koka xwe kurd in. Kurdê ku Mevlut zêdetir nas dike, bi salan hevalên hev in, kurdekî ji Bingolê ye,

¹ Rohat Alakom, Berfekurdên Orhan Pamûk, *Nûbûn*, nr 85/2007, rûp.68–71. Rohat Alakom, Çağdaş Türk Edebiyatında Kürtler, Avesta, 2010.

navê wî Ferhat e. Di nav hêzên polîtîk yê çep de bi aktîvî kar dike. Bi Samihayê re, xwîşkamevlut re dizewice. Piştî şerê kurdan û ordiya tirk sor dibe, gundê bavê wî li Kurdistanê tê vala kirin, pîrka wî (dîya bavê wî) ya ku tirkî nizane tê Stembolê. Bavê wî ligel kesên din piştî gundê wan hatiye şewitandin ji Bingolê hatine Stembolê bûne komeke mezin. Yek ji wan kurdên ku Mevlut nasiya xwe didê hûrdefiroşek e ku li Taksîmê nêzî Camîya Axa kar dike. Mevlut bona ku nikaha xwe bike diçe bal vî melayê kurd ku Lîseya Îmam Xetîbê xelas kiriye. Dema Mevlut diçe bal vî kurdî ew hin tiştan ji Mevlut dipirse û şîretan lê dike (rûp.180). Ferhat di dawîya romanê de tê ji aliyê hin çeteyan de tê kuştin. Stembol jî çawa em li vir dibînin ji van kurdên tengezar re nabe yar.

Di romana Orhan Pamuk a bi navê *Di serê min de ecêbiyek* de bûyerek heye ku wek pêkenînê tê vegotin bala me xwendevanan gelek dikşîne. Vê pêkenînê Ferhat ji hevalê xwe Mevlut re vedibêje. Mevlut wê tu car ji bîr nake. Dema darbeya leşkerî di sala 1980yê de li Tirkîyê çêdibe bajarê ku herî zêdetir dibe hedefê zordestî, îşkence û lêdanan çawa tê zanîn Dîyarbekir e. Di demeke wiha zor de rojekê parêzgerê bona lêkolînan bike diçe Dîyarbekirê, texpîyekê sîyar dibe û bi şofêrê texpîyê re gotûbêjan, galegalan dike. Şofêr ji ber ku vî parêzgerî nas nake, dema parêzger jê dipirse “Li Dîyarbekir jîyan çawa ye?” wiha bersîva wî dide: “Hemû kurd ji rêvebiriya leşkerî ya nû gelek kêfxweş in...” Dema parêzger dibêje “Ez parêzger im û hatime vir bona van kesên îşkenceyan... dibînin biparêzim”. Piştî van gotinan şofêr dev ji wê dîtina xwe ya berî demekê berdide û dest bi zordestiyên li kurdan dibin, dike. Parêzger paşê gotinên wî dibire: “Lê berî gavekê te tiştine tam dijî van digotin”. Paşê şofêr wiha bersîva wî dide: “*Birêz parêzger tu heqdar î. Dîtina pêşîn dîtina min ya fermî bû. Gotina duwem dîtina min a şexsî ye*”. Parêzger di dawiyê de heq daye gotinên vî şofêrê hişyar û çavvekkirî! (rûp.334). Orhan Pamuk vê pêkenînê di beşa romanê ya 5an de vedibêje. Di destpêka vê beşê de ew van gotinên Îbni Zerhani dubare dike: “*Di buhiştê de nîyeta dil û nîyeta zimîn yek in*”. Gelo di dogehê de çawa ye? Bersîva vê pirsê jî rewşa Dîyarbekirê ya van salan baş nîşan dide. Di çend cihên romanê de îfadeyên “dîtina fermî” û “dîtina şexsî” derbas dibin (rûp.464). Li Kultepe û Duttepeyê ji serê wan

zêdetir kurd hebûne. Lê belê kurd tev de tu kesî nikaribûye peyva kurd zêde bi kar bîne, ev nava di cîhekî hişê mirovan de wek “dîtineke şexsî” wisa dimîne (rûp.103).

Mirov bona ku li ser pêyan bimîne gelek caran hewl dide xwe dispêre stûnekê û xwe pê digre. Jîyan divê bi alîkariya van pêgirtinok û sparteyan bidome. Dema mirov rewşa Mevlut tîne ber çavan mirov wê ecêbiya di hişê wî de jî dikare baştir fam bike. Mevlut ne keça ku dibe evîndarê wê, keça ku êvarê di tariyê de wê direvîne mecbûr dibe wek jina xwe qebûl dike. Tê gotin ku paşê wek malbateke dilşa jîyana xwe domandine. Xwendevan niha bi rehetî dikare bipirse: *Gelo ev zewaca van herdu canan, dîtina Mevlut ya fermî yan jî ya şexsî bûye?* Ev dudilî, dubendî û bêgavî di hişê Mevlutê jî ku kuçe–kolanên Stembolê serobino dike de hertim tê û diçe. Ev hat–çûyînên ramanî navê romanê jî tîne bîra xwendevan: *Di serê min de ecêbiyek.* Di vê romanê de coxrafya ku kurd jê hatine nîşanî me dide ku kurd ji herderê Kurdistanê hatine Stembolê. Dema şerê di navbera kurd û ordiya tirk de sor dibe li herêma Taksimê (di wergera swêdî de Dolapdere derbas dibe) tijî koçberên kurd dibin. Jina Mevlut Rayiha ji dikaneke kurdekî Dolapdereyê sobeyekê distîne. Ev kesên ku nû hatine wek Ferhat wisa nerm nînin, kesine serhişk in (di wergera swêdî: mîlîtanê fanatik derbas dibe). Gundên wan hatine şewitandin û ev gund di şer de hatine vala kirin (rûp.253).

Xudanê Loqenteya Karliovayê ku li Tarlabaşiyê dimîne kesekî ji Bîngolê bi navê Qedri Karliova ye. Berê meyhaneke huriman li vir hebûye. Dema di sala 1964an de hurim ji Stembolê hatin dûrxistin ev loqinte dikeve destê kurdan. Wê demê Qedri di loqenteyê de wek karson kar dikir. Dema ew ji Stembolê tîn avîtin derva, loqente ji Qedrî re dimîne. Orhan Pamuk dema di vê romana xwe de qala hin cîh û meknan dike, ew bala xwendevanan dikşîne xweyî–xudanên wan yê kevî. Tarlabaşi berê mekane hurim, cihû, ermenî û suryanîyan bûye (rûp.258). Beşeke eşîreke kurdê herêma Agiriyê hêdî hêdî li taxa marangozan li Tarlabaşiyê cîwar dibe (rûp.67). Dema lehengê romanê Mevlut leşkeriya xwe diqedîne, ji Qersê tê Stembolê li Tarlabaşiyê di qatê duwem yê maleke hûrman de

dimîne. Carina ev gotinan jî tên guhê Mewlud: “*Hurimên kevn ji kurdan baştir bûn*” (rûp.259). Di navbera salên 1950 û 1960î de çawa tê zanîn li hemberî van komên ne-îslam dijayetîke nedîtî bi zanetî dest pê dike. Hemû bi darê zorê û ji tirsan cî-warên xwe hîştin ji tirs canê xwe dero-dero bûn, her yek çû cîhekî ji xwe re hêlîn û stareke nû çêkir.

Kurdên ji Merdînê li Stembolê komeke mezin pêk tînin. Gelek ji wan dolmeyên mîdyeyê difroşin. Ligel li Merdînê behr tune ye, ew li Stembolê bi vî karî ve mijûl dibin. Hin kes vê yekê bi çavvekirî û zêndariya wan ve şiro vedikirin. Yek ji wan lehengên romanê Ferhat dema rastî hin Merdînê hatiye wan ji Ferhat re gelek besnê Merdînê dane. Ev yeka di romanê de wek “Netewevîniya Merdînê” hatiye navandin. Ew xortên merdînê û Ferhat carina laqirdiyan jî dikin: “*Wexta Merdîn wiha şahane xweş e, we çima berda bûn hatin Stembolê?*”. Zarokên feraqşoş jî zanibûn ku Ferhat laqirdiyan dike, tenê dikeniyar” (rûp.145).

Di nav kurdên ku koçberî Stembolê kirine beşek kurdên Dersimê jî hene. Orhan Pamuk di vê romana xwe de carina Dersim carina jî navê Tuncelî bi kar tîne. Hêzên polîtîk xweyê dîtînen rast dixwazin kurdên ji Bingolê û Tuncelîyê ji taxa Kultepeyê derkevin. Sê mal û çar dikanên ku xweyê wan alevî ne tên şewitandin. Kesên êrişkar dikana dersimîyan jî dişewitînin. Li Pangaltiyê xweyê dikanekê kurd û aleviyên Maraşê ne (rûp.87). Kurd û alevî alîkariya hev dikin (rûp.133). Orhan Pamuk di romana xwe de gelek caran peyvên kurd û alevî wek cotepeyv li pey hev rêz dike, wek mînak “Kurd û alevî ji herderê welêt koçberî taxa Gaziyê jî dikin”. Di romanê de em rastî kurdên alevî jî tên (rûp.106).

Hin malbat ji Cîzreyê hatine Stembolê. Kesekî ji Cîzreyê bi navê Cezmî bi salan cîhê parkan daye xebitandinê. Ketiye girtîgehê û derketiye paşê gelek dewlemend bûye, li taxa Taksîmê wek zorbemêrekî hatiye nasîn (rûp. 200). Kurdên Cîzreyê kluba şevan ya bi navê *Mehtap* didin xebitandinê, hewl didin zora kluba bi navê *Tav* bibin û nifeyê li deriyê wê bixin (rûp.371). Şerê kluban her berdewam e. Çeteyên kurd jî peyda dibin, wek Çeteya Merdînê û Çeteya Dîyarbekirê. Carcar di navbera van çeteyan de nakokî, dubendî û şerên mezin derdikevin. Hin kes dibin goriyên van

bûyerên neçê. Tê gotin ku yek ji wan lehengên romanê Ferhat di navenda Stembolê de bûye goriyê van pevçûnên çeteyan (rûp. 420).

Kesekî salbuhirî ji bajarê Muşê bi salan li Stembolê birincê bi nok firotiye. Paşê nexweş dikeve û dixwaze him erebeya û him jî mafê cîhê xwe ku li herêma Kabataşê dimîne, bifroşe. Lehengê romanê Mevlut û jina wî Raziya çêkirina pirincê bi nok ji vî kesê Muşê fêr dibin (rûp.199).

Di vê romana Orhan Pamuk de tîpên jinên kurd jî hene. Dema lehenga romanê Samiha qala jîyana xwe dike jineke kurd dide nasîn ku ji Meletyê ye. Wisa xuya dibe ku ew jî wek Samihayê ji dilketiyê xwe re reviyaye. Kêfa vê jina meletyeyî gelek tê dema ew besa reva xwe dike, polês û cendirme çawa li pey wê ketine (rûp.229). Di romanê de serpêhatiya hin jinan hene ku enînivîsa gelek jinên kurd perve dikin.

Dema xwendevan tê dawiya romanê dibîne ku Stembol êdî çehreyê xwe diguhirîne, dibe bajarekî nûjen û mezin. Ew xaniyên ku berê salan di şevê de hatine çêkirin û wek şevholik (bi tirkî: gecekondu) derbasî dîrokê bûne, yek bi yek ji ortê radibin, li şuna wan apartmanên pîrçat bilind dibin. Beşek ji wan mal û cîhên karên hurim, ermenî, cihû û suriyanîyan jî dibin goriyên van guhartinan. Em vê carê gelek ji wan lehengên romanê di yek ji van apartmanên bilind de dibînin. Guhartinên mezin li Stembolê diqewimin. Lê belê lehengê romanê Mevlut wek berê dîsa berdewam dike di kuçe û kolanên Stembolê de bozayê difroşe: *Boo zaa!!!*

Sîyarê Têrika –9

Bi zaravayê mikaîliyên Polatliyê

Dr. Mikaîlî

drfyildiz@hotmail.de

OS DİZİVRİ GUND

Os û sipahî ji siwê heta êvarê li pišta hespa bi rêva çûn, ro çû ava ew jî gihîştin bajarî Boliyê. Li vir di kerwanserayekê da şev derbaskirin. Di berbanga siwê da dîsa derketin rê, heta êvarê jî gihîştin çiyayê Aydosê, nêzikî Çangiri, Çetkeşê.

Os pîrr cara bi Êla xu va berbi biharê dihatin va çiyana û heta payîzê pezê xu li vir diçêrandin, berxe xu gir dikirin û dibirin li Stênbolê difrotin. Hîn ku zivistan nehatîyi jî dîsa dizivriyan cîwarên xu. Ji ber vê Osê ji xelkê vira hîn meri nasdikirin. Çû ji wana pirsî, ka êla wan hatiye vira, yan na. Wana jê ra gotin ku ew berî çend roya kone xu berhevkirine û çûne gundî xu, li Heymanê.

Ew şevikê jî li wir man. Henda rîya wan a rokê ma wû. Herçik nêzik mala xu diwû kelecana dilî wî jî girtir, pîrrtir diwû, meraqa wî jî.

Ka ew ê wî nasbikin, yan nasnakin, ku naskirin, ê çî bikin, çî biwêjin?

Berêvar bû, Osê ji dûrva kone eşîrê dîn. Gund li ber hozeka fere û gir li bintara şkewt û qewara bi cî biwû, çend malê bi dîwarê ji heriyê û seri bi cîl û qamişa porkirî jî ava biwûn. Wexta Osê gund terikandîwû, hîn li gund tu xani çênewû wûn.

Bi dîtina gund va Osê hespê xu da tîzika, lê hesp ewqas westîya bû ku, te çî bikira zûtir nedibeziya. Li ber gund kanîk hewû, ew li ber kaniyê ji hêsp daket, serberê xu dawşand, devrûye xu şuştin, hespê xu avda.

Di bin çava da jî tim li hêla mal û kona dinêrî, dî ku ji nav kona da çend keçik derketin û di destî wan da kuz û çingil, tèn avê.

Os pîrr bi heyecan wû, lê nedixwast vê eşkere biki. Ka ew kî bûn?

Keç bi ken û şenahî hatin ser kaniyê, ku wana ew mêrikî xelk dîn, hînkî xu giran girtin, dengê xu birrîn. Osê yek yek li wana, wana jî li Osê mêze dikirin.

Ji nav wana yek dişîbî bera wa-

na, mala wana, lê ji ser terikandina
Osê ra 20 salî zêdetir derbas bû wû,
Os ji xu ne bi guman bû.

Wî hespê xu kişand kélékê, ji bo
yî ku bira keçik ava xu tijikin.

Ji keçika yekê wêrî û ji wî pirsî;

Rêwiyo! tu ji ku tê û teri ku derê?

Os li benda vê pirsê bû, lê hema
negot ew kî yi û bibersivand;

Ez ji stenbolê têm, ber bi gundi
jorin terim. Lê ez û hespî min em
pir westîyanê, gelo em bixwazin
li vir şevê derbaskin, ez dikarim
li konî kê bimînim? Yan jî oda
mîvana heyî?

Ew keçika ku bi wî va deng
kirûwû, cardin bersiv da;

Erê tu dikari li oda apî min bi-
mîni!

Ew li pêş, Os li paş, çûn nav
gund.

Ku gundîya bihîstin mîvanik
hatiyî, ji kon û xaniya çend mêr û
xort din derketin, ew xêratî kirin,
rîya odê ra wî dan.

Osê ji dengkirina wana zanî ku
ew oda apî wî yî, apî wî yî Îsmail!

Xortikî hespê wî hilgirt bir êxur,
î din barê wî ji piştê hêsp dayna jêr
û kişandin zik odê.

Osê bi xu xuva got; Erê Êla me
hîn jî weka berê ji mîvana hez in.

Piştî ku ew bi cî kirin, xortî ku

hin bi sala ji yê din mezintir xanê
dikir, got;

Herin ji mîvên ra şivê bînin!

Gavik şunva ew xort li siniyekê
bi şivê hat, li dû wî jî kalekî rûspî
giran giran dihat.

Osê di rêvaçûna wî da ew naskir.

Ape wî wû...

Heta nika kesî ew nasnekiriwû,
lê duwû ku apê ew jê derxista.

Êvar bûwû, odê da lambeka
petrolê vêdiket.

Apê ew xêratî kir çû li joriya odê,
hêla bacê li ser kulêv rûnişt, ew ca-
reka din xêratî kir.

Ji Osê ra got; Xorto tu şîva xu
bixu, tu ji dûr tê, niha birçî yi!

Walle ew rast bû, Os nêza dimir,
lê ji wê jî muhimtir ew bi hesreta
dîtina mala xu, dê, bav û xuşka xu
dimir...

Xadê ji mîvandariya te razî be A-
po! got û dev bi xarinê kir, Apê bêyî
ku bêrehetiyê bidi wî, li wî dinêrî.
Ka ew kî ye, çi ye? Ji ku te? Teri ku!

Meraq dikir...

Paştê xarinê ji xorta yek hema
meşîya sifre berhevkir, di dest da
mîsin û legan hewû û li piştê jî
peşgîrik dadiliqî.

Osê destên xu şuştin, duaya
xarinê kir û xu paş va kişand, piştê
xu da dîvêr.

Gavik şûnva mêre Êlê, ê gund yek yek kişyan hatin odê.

Li va derana pirr hindik kes di hatin û diçûn.

Ku kesek hat jî kêfa xelkê pê dihat. Ku ew ji bajara dihatin, bi meraq jê dipirsîn, ka li wa derana çi diwi, çi diqewimi? Hele mîvanî ji paytextê hîn jî bi rûmet bû.

Osê ji nav barî xu hinkî titûna zer a traqyê derxist da ber wana.

Wî bixu titûn nedikşand, lê ji wextê wakîna ra, wek xelatî bi xu ra çend kilo hanîwû.

Pêšta apê, dû wî ra jî gundiya yek bi yek xu berra titûnê dan ew pêçandin û kûr kûr kişandin.

Ode tarî bû, niha bi dûyî titûna wana hîn jî tarîtir bû.

Osê pirraniya wana nasdikirin, lê wana ew nasnekirin. Bi wayê kêfa wî hat, wek listikekê bû.

Çend saeta ji vir û ji wir da qal kirin, qehwe hat, çay hat, ku hêndi tiştik nema û şor jî qut bû, ew jî gî dibenijîn, Apî Osê got;

Ciranno! Mîvanî me ji rêki dûr hatiyî, ka bira ew bîna xu bidi ber xu, em jî hendi below bin!

Os bi vê şa wû, di zikî xu da got; Tu her hewe Apo!

Hînik ji gundiya destêr xu avêtin nav titunê, yek kulm jî bi xu ra

birin. Tehma va titûne Stenbolê di devî wan da mawû.

Osê çito xu gêr kir ket xewê. Bîna nivînên hînnû bi sawûnê hatî şuştinê, teze, ket poz bivîli wî.

Rîya walîn bi dengî dîka û kûçika heşar bû, bi meraq rawû pê, çû devrûye xu li ser kaniyê şuştin, yek li zindarikî bandi da. Desmiya xu hilgirt çû oda camiyê.

Ew odeka ji heriyê çêkirî, seri bi cîl û axê porkirîbû.

Xortikî nûgîştî mêtetî dikir, ji mala Silî Xoce, yekî zer û bejindirêj, deng nerm, rûken.

Ji gundiya pirr kes nedihatim limiya siwê, tenê melle, apê wî, Usî melle û Husî Xanê û lawê wî Yeho, Deli Yeho, hewûn.

Limê(nimêj) qedandin derketin derva, Gundîya ew xêratî kirin, Yehoyî Husî Xanê li wî nerî got; Navî te çi wû Xorto?

Di hatî da heta nika hîn tu kesî nave wî ji wî nepirsî wû. Ew mîvanê Xadê wû, rêwikî îro heyî û so da tunneyî!

Hinkî bi şaşî; Os! Os! ji Stenbolê têm, terim gundi jorin!

Haaa got Yeho, serê xu leqand.

Te xurînî jî hîn nexar! war nini?

Osê bi fedî, serê xu kir ber xu.

Ka em herin mala me bixun,

mêrno ji we jî kê xastî bira bi me
ra warin!

Yeha birê Hevê wû, Hewa Osê,
a porsor, dilê wî, evîna xortiyê. He-
wa ku wî bê haya wê jê hewi, ew
terikandî wû, li paş xû hiştî wû.

Ew yek va hat bîra wî, tirsîya,
got;

Na na nekevin teşqalê, ezê li odê
tiştina bixûm!

Li gund, di nav eşîra da ji Yeho
ra, ji ber ku şora xû venedîşart û
pîrr camêr bû, Deli Yeho jî digotin.

Yeho ha dîn dîn çavên xû girki-
rin û ji vîra bi dengê bilind got;
Dawete Deli Yeho nê redkirinê
Mîvano!

Vê rind bizani!

Ket pîyî wî û ew bi xû va kişand
bir.

Cemaat jî li dû wana...

Ew hîn di kona da diman, jina ji
dûrva dîtî ku Yehoyî dîsa mîvana
tîni, hema ketin telâşekê.

Dorber serrast kirin.

Ew derbas hundirî konî mîvana
bûn, çav û diê Osê li Hewê dige-
riyan. Lê bi xû xû va jî digot;

Na na! Di eşîrê da keçîkik ew
qas sal di mala bavê da namîne, ew
sedîsed dane mêt.

Lê ku wî hîn ew difikirî, yek va
dî ku, Hewa wî li paş kerebalixa jin

û zariya va bi meraqeka mezin bi
çavî xû yî keskheşin li wana dinêri.

Os tirsîya ku bê naskirin, hema
seri li ber cû xuz kir û xû avêt zikî
kon.

Yeho got; Lawo ew çî telaş e, hê-
dî hêdî! Walleh mîvan pîr birçî yî,
zû sîfrê daynin!

Osê fedî kir.

Yeho bi dengê bilind kenîya,
gundîye din jî bi wî va.

Os jî kenîya. Disa di nav gundîyên
xû da wû.

Bê teklîf û ji dil, mîvanperwer û
henekçî, qerfçî.

Şa bû.

Hewê bi keç û xortê din va ji
wan ra xizmet dikir. Çavê xû tim li
wî bû, lê ew nasnekir.

Wê li piştî reva Osê çiqas xazgî-
nîye xû hatiwûn, gî qewitandî wûn.

Ne gotina bavê, Husî Xanê, ne jî
ê bira têtê nedikir.

Wê digot; Hûn ji min heznakin?
Naxwazin ez li ba we bim û heta
mirinê xizmeta we bikim?

Wana jî dîzanîn ku dilê wê di
Osê da mawû û di nav hevala da jî
tim digot ku; Min ser Osê ra sond
xarî, ez bêyî wî kesî nakim!

Ez para wî mi, heta mirinê li
benda wî mi!

Keçîka digotin; Keçê tu jî mîna

Yehoyî birangî xu dîn î! Os reviya çû! Him tu, him jî dê bavê xu ji bîra kirin, tu bi dû wî ketiyi! Guneyî ji te ra!

Lê di hêlikê da jî ji eşqa wê û Osê diqariyan, dilê wan diket evîna wana.

Osê bi xu xu va digot; Lo va dîna hîn nezewiciyî, li benda min sekiniyê eceva?

Na lo, belki li mala bavî xu zey i... erê erê wakina yi! Veng xu dida îna kirinê.

Yeho yekî wek cunna wû, dîsa bi henek got; rêwî ew xanga min e, mîna min hinkî dîn î!

Mêra naki! Bi tu kesi qeyil nawi, te xastî em wê bi te din!

Hew bi hêrs reviya derva, Os lal bû, bê çi. Fedî kir.

Gundî dîsa pê kenîyan, giştika heneke Yeho dizanîn, nasdikirin.

Hew cardin nehat xizmeta wana, Os pê êşya, ew bûwû sebeba vê ku, xelk bi Hewê dikenîyan, di alî dîn da jî pir şa bû ku ew hîn li hêwîya wî ma ye.

Piştî xarina xurunîyê destur xwest, bi yên dîn va tevhev gî rawûn.

Çû odê.

Derî li ser xu girt, li ser kulêv xu dirêj kir, çavên por kirin, destê

dan binî serî xu û heyata xu ya ku heta niha jîyaye, ji ber çavi xu ra derbas kir. Wek xevnekê wû, nika dîsa hatiwû ew şûna ku jê reviyawû, ew şûna ku wî ji hertiştî pirrtir jê rik girtiwû. Lê bes heta nika kesî ew nasnekirûwû.

Ji xu ra got; Eceba ez nika herim derva, mala dê û bavî xu û ji wan ra biwêjim, ez kî me?

Lê him bi eşkerekirina xu ditirsya, him jî nedizanî çi bike.

Heta berêvarê wekîna di oda apî xu da ma.

Bi lêdana derî oda va xu berhev kir, rawû pê û got; Ew kî yi? Warin hundir!

Dengê keçikekê hat; Ez im Fat! Fata Usê! Destûr heye?

Xanga Osê wû, Os bi heyecan meşîya deri wekir, xu bi zorê digirt ku xanga xu hemêzkî, çave xu dikenîyan.

Wari xangê! got

Fatê got; Min ji we ra şiv anî!

Fat keçikik ezew bû, ku Os ji malê reviya wû, ew hîn zaro wû, Osê ji wê pir hezdkir, Os diçû ku derê, ew ji li dû wî dipekiya, mîna ordekekê.

Osê dest bi xarinê kir, di helkê da jî bi Fatê ra ji wir û ji vir da deng dikir.

Xûna Fatê keliya ser wî, piştî xarinê wê sifre berhev kir, xatirê xu xast û çû mal.

Tiştik hewû ku va mêrike nenas û xelk dikşand wana. Xûna wê ji wî ra dikeliya.

Ji dîya xu, Hec Zêw ê ra got;

Eyê mi şiv ji mêrikî di odê ra bir, xûna min keliya ser wî, tu yê niha ji min ra bi hêrs keve, lê min xwest ew hestê xu bi teva parva kim, Ji wî bîna Osî brangî mi te!

Min pîrr bala xu dayê, rawûn, rûniştina wî, xarina wî, kenê çavi wî, pîr dişibi wî, lê tenê lêva vî saxlem i û rû berdayî.

Hec Zêw ji çûyîna Osê virda tim digirya û reş giredawû, tu tiştêkî, kesî nekarîwû dilî wê yî birîndar pelpûn bikî, rûyî wê kenandin bidî.

Hendî çava jî nedidî.

Bi gotina keçika wê, Xadê ronayîyek xist dilî wê, piştî ewqas sala cara pêşin rûye wê keniya, bi wê va jî rûye Fatê.

Ji Fatê ra got;

Heri ban bavî xu ki, em bi wî jî bitanişin, ka ew diwê çi? Em ê niha tiştikî şaş nekin, bira xelk bi me nekenni!

Fat zûzikê da meşya derva, bavê xu Us ji limiya(nimêj) êvarê dihat, ber bi wî meşya û got;

Bavo! wari dîya mi ban te dike, heycana wê ji rû da xanê dikir.

Vê bala bavê kişand, ji xu xu va got; Ew tiştêkî pîr muhîm i, ecewa xazgîncîye keçikê henî?

Ez tîm delala min! Dilî wî ji bo zaro xu pîr nerm wû, ji wan pîr hez dikir.

Çû hundir, Hec Zêw li quncî xêni, li ser baliva ji xelî unandî rûniştî wû, dest da tizbiya nodûneha, ew bi deng dikşand, rûbiken wû.

Dilê Usê bi rûkeniya bermaliya xu şa wû, çû li teniştta wê rûnişt, pîye xu avêt stuyî wê û jê pirsî;

Çi qewimî jinik?

Zêwê ji wî ra qala gotinên keça xu kir û jê pirsî ka ew niha çi bikin.

Ûsê nedixwast bira dilê jinê xu carike din bişkê, lê ew gumana da zikî wan da, ket zikî wî jî.

Rawû pê û got; em dikarin wê tenê bi avakî hu bikin! Ez niha terim wî hildigrim, tîm mal! Tu yê bixu ji wî bipirsî!

Dev da ber bi odê, li dêri xist, Osê deri ji wî ra wekir, şaş û metal li rûyî wî dinêrî.

Ûsê got; xorto! ka em herin mala me bi hev ra qehwekê wexin!

Çavi Ûsê tim li wî bûn, Os di berda çû ku tiştike biwî, ne got erê, ne got na, ket dûwî, çûn mala wan,

mala bavî Osê.

Ketin hundir, Os çû desti Hec Zêwê, ew paşkirin, destê dîya xu, bîna dîya xu. Çiqas jî bîra wê kiriwû...

Ew qe ji bîra wî derneketiwûn, di şeva da diketin xevna wî.

Zêwê ew rind nedidî, lê bi bîné dixwast bizane ka ew Lawike wê yî, yan na.

Os çû li ser balivkê rûnişt, bavê û xelkê malê ew xêratî kirin.

Fat meşya, qehwa da ser êr.

Usê hîn dest bi şorê nekiriwû ku, diya wî Zêwê şor ji devî wî hilgirt û jê pirsî;

Xortî delal! ew çend royî tu li virî, di Oda xenzurî mi da dimînî, ji mîvana nê pirsirin ew kî ye û ê kînga jî here!

Lê keçika min û em ketin gumanekê, qala çiroka reva Osê kir û jê pirsî; xûna me keliya ser te, Xorto tu pir mîna lawikî min î, ka tu ew î yan na?

Eger tu ew ni nî, li qusura me nenirî!

Demika kin derbas wû, Osê hendi nekarî li hîssê xu ra bê bese û rawû pê û xu avet destûningi dîya xu.

Bi tiji kenûgirî got; erê Eyê! erê, ez im! Os im! Osê te! Ez hatim eyê!

Mi pirr bîra we kir, pirr!!!

Giştika xu avêtin serhev, hevûdu hemêz kirin, dest bi şinikê kirin, şîna kêfxaşî û dilşahîyê.

Cîran gî bi ew şîn û qîrrina wan hesiyan, tirsîyan ku yek ji wan miriyî yan jî ew çi hawar bû?

Male gund pirr nêzikî hev bûn, gî di nav hevda wûn.

Cîran yek yek bi yek kişyan hatin, hatin ku çi biwînin, Heczeynewa porhinne û sofî kitana seti ji ser da xar bû yî ketiyi stû, bi mêrî xu Êsê va ketina desti rêwiyî odê, govendê dikşînin, him distirên him digrîn, him digrîn, him dikenin.

Kesî tu ji va halî wana tiştik derneexist.

Cirana gotin, eywax ku eywax, vana giştika heşê xu xarinê, gune ye!

Mezinê gund Huse Xanê hat li ber wan sekinî û got;

Êso xê re? çi ye ew, çi bû?

Êsê got; brango! Qe pirsneki! Qeder dîsa li rûyî me ra kenîya, Osê min hat! Osê min!

Wayî ,ew e! Ew e!

Bi destî xu mîvanê li odê Îsmail dima, ra wî dida.

Os ber bi Husî Xanê va tot kir. Husê hîn ina nedikir ku ew rast bi, lê ku Os ber bi wî va hat, bêyî bifikiri destê xu avêt simêla wî, tiliyê

xu li ser lêva jor gerrand, birîna neştergeriyê hat ber tiliya, wêngê pê zanî ku ew bi rastî jî Os e, Os hemêz kir, ji eniyê da paş kir.

Erê ew Osê we ye, tu bi xêr hatî xarzê! Tu bi sersera hatî! Te çavê me li rê hiştin lawo!

Os çû deste wî, dû ra herkesî yek bi yek Os xêratî kirin, Heci Zêwê jî heşê xu hatin serî, hinkî ji xu fedî kir, hema kitana kişand serî xu, şehr li eniya xu va şidand.

Xelk dawetî hundir kir, keçik, bûk, paqij gî meşyan ji gundî ya ra şerbet çêkirin anîn.

Herkes li benda qalkirina çîroka Osê wûn.

Pir pirs hatin, Osê ew gî bi sebr bersivandin. Ev bala Gundîya jî kişand, pê hesiyan ku Os wek merikî zane û dewletî zivirîyi gund, pirraniya wana şa bûn ku ji êla wana, yekî wek wî jêhatî derketiyî.

Le hînik hesudên gund qe ji paşva zivirandina wî heznekirin.

Piştî çûyîna gundîya, çûn ji odê bare Osê hanîn mal.

Osê ew vekirin, bi xu ra ji herkesî ra xelat hanîwû.

Xeftane stenbolê, çîn bî çîn ji hewrişim, dismale rengareng, tizbiya ji kevra bi zîvê xemilandî, bastuna ji darê gula hatiyî neqşan-

din û hîn pir tiştên din jî. Zaro jî ji bîra nekirûwûn. Ji tucçarên yêrmani listikên zarya, e ji dara çêkirî hanî wû. Hesp, ereba faytûnê, keç û bûke ji bo listikê.

Ew li zarya belaw kirin. Zaro bi yekva ji xenî derketin, çûn derva, li ber malê xelatî ra hev dan û dest bi listika holik û qursika kirin.

Giştika bi heyranî li wî mêze dikir.

Dîya wî, Hec Zêw qe li hêla wî ranewû, destê xu tim li rûyî wî wûn, li ser digerlandin, ew bîn dikir, paş dikir û digot;

Oso dîya te qurbana te! Xadê ew roya jî ra mi da, min tu dî!

Ji vê şûnva ez bimrim jî hendu tu xema min nini!

Xadê neki Eyê! got Osê.

Ka ez hîn hinnû hatim, Xadê omrîkî dirêj bi tedi!

Heta berbanga siwê raneketin.

Berbanga siwê Osê got; Wexta limê hat, ka em herin limiya xu bikin dû ra jî rakevin, emê hevudu hîn pir biwînin.

Os çû ser kevrî ber camiyê banda, e ku limê dikirin bi va dengî xaşik û bi meqam pir dilşad bûn.

Limiya siwê li paş Osê kirin.

Bi serbilindî...

Camiya gund ji herri û kerpiça

ava kiriwûn, seri jî bi qamiş, cîl û çoraxê girtiwûn, di bin banê da jî, ji bo yî ku xaliya asraxê li ser cemaatê ra neweşî, bi xesîra por kiriwûn.

Deri jî dîsa ji dara wû.

Osê ew bi mizgefte Stenbolê va da berhev, ên ku gir, çin bi çin, bi qubbe û stûn bûn. Osê di zikî xu da got; Ji gund ra ji dereka hînnu lazim i.

Xebera hatina wî gund bi gund, êl bi êl li herderî navçê belaw bû. Mala bavî Osê bi hefta bi mîvana tiji bû. Kî hat bi xu ra jî berxik, beranik, kavirik dihanî. Edet wakîna wû. Herkes li gor dewleta xu...

Parik ji van xelatîyana ji oxintiya ra serjêkirin, le ku dawî li mîvana hat, hîn jî qasi du kerî pez li ber malê mawû.

Osê jî kî hat, dîyariyek dida wana. Ji hinka ra dismalek, ji hinikara peşgîrek, şehrek, kitanek, tizbiyek.

Tu kes destvala nedişandin.

Comerdî û dewletîbûna wî, ilm û zanetiya wî jî li navçê belaw bû.

OS BÎ HEWÊ VA DÎZEWICI

Osê di vê navberê da ji xanga xu hu kirûwû ku Hewa wî hîn li benda wî maye, heta nika jî mêr nekiri wû.

Piştî xelasbûna mîvana Osê bi mezina ji wê ra xeber şand ku ka ew

hîn wî dixwazi yan na?

Ew jî li benda vê xeberê wûn, gotin bira warin xazgîniyê, ew para Osê yî!

Çûn nişan pêva kirin, edet bû hinkî ji bo dergîstîye disekinîn, lê ew nesekinîn li dû nişanê hema wexta dawate jî birrîn.

Osê wek qeling, wana go çi gî, zêde zêde da.

Dawatika bi şan û şuret kirin, hefteki def u zirne lêxistin, çiqas êl û nas hewûn gî hatiwûn dawetkiriñê.

Osê li paş camiyê ji xu ra malik, li gor mali Stenbolê da avakiriñê. Hoste gî yermani wûn, ew ji Engürüyê dawûn hatinê.

Deriyê malê ji dara û mezin bû, boyaxkiri bû, li ser bi herdu aliya va du helqeyê gilover dadiliqîn, ku yekî bixwasta, di hundir keve li wan dixist û dikete zik malê. Di ziki malê da şûna avlixukiriñê, xaniya bara, xaniye stêr, xaniye mîvana û aşxane ji hev cûda hewûn.

Diwari xêni bi boyaxê reng bi reng suwaxkiri wûn, hosta li ser diwara gul, çiçek û hîn tiştê din nexşandi wûn. Di zik her diwarî da jî dolawê ji dara hatiwûn çêkiriñê, deriyê wana jî dîsa bi boyê xemilandî wûn.

Li gund hîn tu kesi male wek vê

avanekirî wûn. Lê li dû vî, ê ku hal wexta xu da şûnê da ne, pere xu he- ne, wan jî bi ew hostayê yermani ji xu ra male wek vê dan avakirinê.

Bi va hostana li nava gund da camiyeka hînnû jî da avakirinê, wek mescide Stenbolê, neqşandî, boyaxkirî, bi mimberake ji dara, a ku ji Bursê bi kerwanê deve û heştiran da hanînê. Ew darûberê xaniya jî gî ji Stenbol û Bursê hatiwûn.

Kevre û stûney camiyê jî, li nêzikî gund, li aliyê sêbîrê bajarikî kevn a ku ji xristiyanên bizansîya pašta mawû hewû, ji wir da hanîn.

Ji bo yî kevrî miriya jî ji goristana bizansîya kevrêkî wek sanduka hanîn, ew derdexun kirin, li ser vê sanduqê hîn îşareta xristiyana, xaç hewûn, ew hinkî rêş kirin, lê nikarîn giştikî jê va derxînin, ew hîn jî rind xanê diwûn.

Miriyê xu li ser vî kevrî dirêj dikirin û limiya dawî ji wan ra dikirin.

Os hercar ku limiya yekî mirî li ser wir dikirin, di berxu da bi vê dikeniya, xenzurê xu yê berê Kevork û Asparik dihat bîra wî.

Hewşa goristana gund jî tunne wû, gundîya miriyê xu didan erdê û diçûn ji taxa gund kevrê gir û bilind bi ereba ga dihanîn, bi ser wan va dikirin.

Pez û keriyê gund li ser meze- la diçêriyan. Osê ji vê heznekir û li dora wana jî hewlik da çêkirinê. Xelkê Êlan li va derana pez xadî dikirin û malê xu bi vê xadî dikirin.

Lê Osê di rêwitiya xu û jîyana xu ya li Stenbolê dîwû ku pir kes ji ticareta kerwanan baştirin qezencê dikin. Ew çû bajêr li wir ji xu ra kerik hêştir û deve kîrîn û anî gund, serkerwancî û şivan û dojewan jî ragirtin.

Ji waliyî Engürüyê izn xwest ku ticareta xwîyê ji gola xwê biki û ji bajarên mezin jî qetran û hacetên din ê gundîya bikşîni.

Hînika ji gundîya dîn ku ew bi vê rîyê pîrr pere qezenc diki, wana jî çûn ji xu ra hêştir, deve kîrîn. Li gund qasî 400 heştirî bû.

Gund di nav çend sala da bi dewletîwûna xu bi nav û deng bû.

Vilayeta Engürü jî bi va dewlemendîya Êla Mikailîya hesiya. Hendu ku ji Stenbolê ra pez hesp hewce bû, xeber ji wan ra jî dişandin ku ew jî malî xu biwin paytextê bifroşin serayê, dewletê!

Osê li du gundê din jî mizgeft dan avakirinê, medreseya xwandina vekirin.

Ji ber ku Osê li dû hatina xu him pîrr pere xerc dikir û pîrr jî xêr di-

kirin hesudê gund, jê diqariyan û di nav xelkê da digotin; Os sehîrbaz e, bi sehîrbaziyê, ji xeta pera çê diki!

Bi vê him dixwastin zîrê bîdin ilma wî û mûmînîya wî, him jî dewletîwûna wî!

Lê li bajêr pir kesa ew û zanabûyîna wî rind naskirûwûn, herkesî ji wî ra digot; Osman Efendi.

Osê ji zewaca xu ya bi Hewê va li paş hev çar lawik û keçîkik wan hatin dunê.

Os, Ahmed, Hamid, İbiş Şewqî, nave mamosteyî xu, melleye mizgefta Walide Sultanê, Şewqî Efendi li lawikî xu kirûwû.

Li doyê jî keçîkik wana hat dunê, Fat.

Osê en pîrr ji Fatê û Ahmed hez dikir, wana çûkên malê wûn, wexta xu pîrranî bi wan va derbas dikir.

Hew bû jîneka camêr, camêrika dînik!

Ku di nav gund yan jî di nav Êla da şer derdiket, kesî ne dikarî wê bigri. Mîna mêmîkî şer dikir, tîr diavêt, şûr dikşand.

Lê Osê tim bi ilma İslamê xelk li hev dihanin, ku di nava gunda yek cara qawxe diwû hema derdiket ser kevrî banga ezanê û ban dida.

Wêngê millet ji xu fedî dikirin û

dev ji şerrê berdidan.

Tenê tiştikî sere wî diêşand, ew jî sîyarîyê Têrika wûn...

Wana hertim xu berra kerî û pezî wan didan, dizîya wan dikirin. Ji tîrsa wana ne dikarî jî xu ra şîvane rabigrin, heywana xadî bikin.

Begê Têrika ra tim xelat dişandin, le wê jî tu têtê nedikir.

Osman Efendi da û stand û qerara xu dayê; Ewê bi wan va bûwûya merî, xisim.

Bi vê belkî pêşî li wana bigirta.

Ji lawikî xu Yîwiş Şewqî ra keça begî Têrikîya, Bican beg xwast, Zeyneb Xanim.

Disa ji lawî xu Hemîr ra jî jî Şêxa keçîkik xwest, wê ra digotin Fat, Fata canbegî.

Bi vê dixwast bi Êlên dorberê va merivtiya xu zêde bikî û bi quvvet bi, piştî xu saxlem bikî, ku bira kes dengî wana neki.

Hinkî ji vê feyda jî dî. Dizî talan hindik bû, xelk rehet bû.

Dû ra wî qîrara xu da ku herî Hec, mala Xadê...

Bi kerwanên, bi hîn çend kesên din va tevûhev derketin rê, ji Entab û Helebê ra derbas bûn, qasî sê meha bi rêva çûn û gihîştin Mekkayê.

Piştî tevafê ji wir hinkî tişt û ji bazara koleya jî ji xu cariyeka xayrî



Yusuf Buhurcu–1963 li Nevşehrê bi turistan re, Ji arşiva H. Hasan Tuzcu

muslim û kolekî reşik, efriqî û yekî
ji qefqasyayê jî kîrîn.

Navê yî reşik Bilal lê kir, wek
navî koleyî Hz Muhammed!

Bilal ji aliyê Sudanê girtiwûn,
yekî mezinî pîrr xurt bû, çavreş bû.
Neditirsya. Tîma dixwast bireve.

Osê ew bi zincira girêda, ji bo ku
bira nerewe.

Navê î ji qefqasya Arnes bû, na-
ve wî jî gorrand, Xêro lê kir.

Navî cariyê Ataris bû, ew nav ne-
gorrand, Ji ber ku navî wê, Asparîka
wî ya delal dihanî bîra wî. Keçeka
zirav û bédeng bû, ji alî filistîne
hanîwûn. Bi eslê xu duruzî wû.

Wexta ew dîsa zivirî gund, şeş
meh derbas bû wû, payiz hati wû.

Gund bi hatina hecîya şên bû.
Herkes hat mala wan, heca wî lê
xêr kîrin. Wî jî ji erdî bimbarek
xurme û ava zezemê hanî wû, ew
li gundîya belaw kîrin.

Gundîya kole û cariyê merak
dikirin, pîrraniya wana hîn qe kesî
reşik nedîwû.

Le Hewa wî bi hatina wî bi
ew cariya xort va qe şa newû wû.
fîrsend di desta keta, wê ye ew bife-
tisanda. Li benda wê wextê wû.

Çiqas bîra Osê kirûwa jî, wê şevê
piştî xu çex wî kir, raket. Rû neda
wî.

Os jî ji rê hatîwû, filitî wû, westî
wû, ji vê halî wê tiştik fehm nekîr,
berda neçû.

PÊKENÎ – SERHATÎ

Amadekar: Nuh Ateş

nuhates@web.de

DEVNEGİRTİN

Zemanekî li gundekî li welatê Romê (Anatolîya Navîn) civata mêran li odeya Hemê Hecî rûniştiye. Şor hatiye ser ava xwaş. Mezin û giregiran her yekî şorek kiriye. Yekî gotiye, bi xwaşbûnê, di ser avê Kanîya Malê Huskê ra av tune. Yêkî din gotiye, ji avê bîrê Osî Cenê xwaştir av tune, heram e. Dirêj nekim, her kesekî şorekê kiriye.

De tu ware wê, hîngê li odeyan mezin û giregiran deng dikir. Ne edet bû, ku kesên salpiçûk yan xizan û şivan deng bikin û teve gilî û gotinan bibin.

„Devî xwe bigre“, „şorê devî xwe bizane!“ Yan „ma te hay jê şorê devî xwe hewe!“ Ev gotin û şîretên mezinan yên berê ji hêlekê da xizmete parastina hiyerarşîya civakî dikirin. Meriv dikane vana mîna çeşidekî sansûre jî bi nav bike. Hereketnekirina li gorê wan bi risk wû, cirma xwe hewû. Carna şoreke bêdiqet û ne li gorê rism û edetên hîngê li serî

merîya dibû bela.

Çelo jî li dawîyê odeyê rûniştibûye. Çima ku şivantî kiriye, wî bîr, kanî û kanîstankên gund rind nas dikirine. Wî xwe negirtiye û teve şorê bûye û gotiye, walle di ser avê Kanîya Milosmên ra, av li rû dinyayê tune.

Axelaran di bin çavan ra bi nerazîbûnê berve wî mês kirine. Giregirekî gotiye, Çelo madem tu veng pê dizanî, de rabe here ji kanîya Milosmên kuzek av bîne, em vexwin. Giregîrên din jî nig dane ser wî. Çelo ji neçarî rabûye û dev dayê rêya kanîya Milosmên ya li dûrî gund.

Bi rê da, ew raste mêriyekî nas tê. Mêrik jê dipirse û dibê, „Çelo xêr e, tu diherî ku derê?“ Çelo lêvegerandîye û gotiye: „Min gava din li odeya Hemê Hecî devê xwe negirt û gûyek xwar. Aniha jî, sewa ku devî xwe pak bikim, diherime ser kanîya Milosmên.“

BARÊ TÎRSÊ

Ji sala 1980î bi şûnda, di pey hatina eskeran ya ser têxt, li Tirkîyê ji mêla sîyasî da, heyamekî pir lihevketî hewûye. Devê şorê ye, meriv ji sîya xwe ditirsîye, hela jî, kesên ku li malên wan kîtab û şîrîtên (kaset) kurmancî hebûn. Pir kesan hîngê ji tirsan ra, şîrît û kîtabên kurmancî vedişartine; henan ew dikirin herde û henan jî ew dişevitandine.

Yaşoyê Elê, hîngê xortekî nûgihêştî ye û nû destpê lêxistina bilûrê kiriye. Di saye hewesdarîya xwe da, wî çend zaravayên kilamên kurdî yên wan deran jî hêvisîne. Ew bi lêxistina wan zaravayên palpali dibûye. Lê derbeya eskerîyê tirs xistiye dilê wî jî. Ew pir ditirsîye ku ji avûrûyê bilûrê da tiştêkê ware sêrî. Tîrsê xwe lê peçaye. Ji ber wê ew nedihewîye, tim û tim bi teleşe wûye. Wî her ro bilûr li derekê vedişartîye.

Dirêj nekin, bilûr li sêrîyê Yaşo bûye bela. Ji ba wî jî ku bilûr hecatekî kurmanca yî qedexe ye. Ji neçarî rokê wî qerar daye ku rê li bilûrê bike û xwe jê xelas ke. Bi dizikî, wî bilûr biriye û avêtiye abdestxaneyê (tuvaletê) û veng ew ji derîye xwe kiriye.

Ciranê Yaşo, Mehmê Zêwê pê hesîyaye ku derdekî Yaşo heye, lê nedizaniye ku çi ye. Rokê mês dike ku Yaşoyî fereh xwîya dikê, bi eşq e û rûbiken e, mîna ku barek ji ser wî helati be. Ew jê pirs dike, dibê, „Yaşo ez î mês dikime tu xenê yî, mîna ku tu ji derdekî xelas bûyî!“ Yaşo lêvegerandiye û gotiye, „Mehmê ma di navberê min û te da be, min bilûr pêr êvarê bir û avête abdestxaneyê, ez jê xelas bûm, walle mîna ku barekî giran ji ser piştê min dêhatibe!“

Almanya (Mainz), 15.09.2016

Bêjenasiya peyva “kon”ê

Yalçin Polat

Mezopotamya û Hîva Adanî (Îngl.:”Fertile Crescent”⁽¹⁾) cîhên li ser rûyê erdê yên siftê ne, ku beriya 12 hezar salan di Dema Neolîtîk de ⁽²⁾ (yewnanî: “neos” = new,nû û “lithos”= lat,kevir) lê Şoreşa Nûlatî destpê kiriye. Di dîroka mîrovatîyê de ev şoreşa ji bo afirandina jiyaneke civakî wek bêhempa têye dîtine. Bi guherîna avhewayê li ser xeta ji Zagros heta ber Deryayê Spî, xezal û ajalên giyaxur ku heta wê demê dihatin nêçîrkirin ji vê diyarê bi pirranî vekîşiyane. Di vê pêvajoyê de mîrov mecbûr mayîne jiyana xwe, ku heta wê demê ji nêçîrvanî û berhevkarî dihatiye qezenc kirine bi jiyaneke nû ve, ku tê de ajalxwedîkirin û rençberî hebûn bigorînin. Ji wê şunda peyvên şivanî, zozanî û rençberî pêwîstiyek wek stûnan dixiste nava mêjiya zimanên li vê derdorê. Em dizanin gelek çîrok di tewrat û încîlê de ji çanda şivantîyê hatine girtine. Di nava Kurdan jî şorên şivantîyê wek “Bizina girrî avê ji çavîyê kaniyê vedixwe!” /”Bizina ecelê wê ku bê *nanê şivên*

dixwe!” ûhd. heta îro jî karekterê zimên dixemlînine.

Zimannasek me bi navê Husênî Mîho hêye, ku ez gelek nivîsên wî di cîh de dibînim, di warê gramer û lêkolîna li ser bingehê zimên xwe li Finlandê gihandiye, bêderew ez nivîsên wî dirêçînim; her çî ew hinek caran bi nimûneyên ji Quranê xwe ji zimannasiya melleî nikane bifiltîne û di vî warî de min hin caran dide kenandin jî, ez bi qelîteyên wî yên akademîk heşyar im. Tenê divê kesek bi kekê Husên re bêje, Kurd ne tenê ji misilmanan pêk tînin, Kurdên Ezdî jî hêne, Kurdên Riya Heq (Şebak, Ehlê Heq, Kekeyî, Yarsanî, Elewî) jî hêne, Kurdên Cûhî, Xiristîyan û Ateîst jî hêne û bandora civata wan jî li ser zimanê kurdî çêbûye. Ji vê bêtir zimanê kurdî di dema Zerdeştîyê gihîştîye qalibekî, kû şopên xwe îro jî baş dikane bêye dîtine. Tesîra zimanên Khurrî, (K) Ûrartûyî, Medî, Partî û Pehlewî li ser lehçeyên me nûjen divên lê bê kolîn. Bi şorên bi peya “Ma

te Qurana pîroz xwendiyê?!” em nikanin di zimannasiya kurdî bi pêş kevin. Pewîstiya Quranê ji bo zimannasiya kurdî sifire, ji ber ku ew bi zimanek biyanî, yanî bi erebî ye û ji aliyê Bedewiyan ve hatiye nivîsandine. Dîsa kêmasiyek Kek Husên hêye, ku peyvên esil–kurdî bi awayek lezî pêşkeşî Erebi, farsî û tirkî dike. Gava em şaşitiyên wî tînin ziman, ew hinek zehmetî dikêşîne, ku rexneyên me yê avakerî fêm bike. Ez di vê baweriyê de me, ku zimannasek xwe li ber rexneyan vekirî bihêle, da ku peysaja ber pencereyê xwe dewlemendtir bike. Ezê îro bi peyva “kon” ê wek nimûne bidim xweyî kirin, ku çawa Kekê Husên bi lezî wek masiya xwe avêtiye ser derewên Tirkan...

“Kon” wek peyvek şivanî û zozanî ji kûrahiya dîroka kevn ya Îran û Mezopotamya yê gihîştîye devokên kurdî ya nûjen. Lê nijadperestên tirkan vê peyvê wek esil–tirkî didin nasandin, bê ku ev peyva di tirkî de bêye bi kar anîn. Tê gotin, ku jiyana eşîrî û koçberiyê bi Tirkan ve hatiye Anatolê, ji ber wê jî pîrraniya peyvên koçberiyê ji tirkî hatine girtine. Wergerîna peyva “kon” ê di tirkî de “çadır” e û ew jî ji farsî hatiye girtine. Tirkan di dîrokê de jî bi

Teoriyê Roj–Ziman (Güneş–Dil–Teorisi) hemû gelên cihanê wek esil–Tirk didan nasandin û Kurd jî wek Tirkên Çiyayî (Dağ Türkleri) îlan dikirin. Di vê teoriyê de tê îdia kirin, ku zimanek kurdî jî tune ye û ev zimanê ku ji aliyê “Tirkên Çiyayî” ve pê tê deng kirin, zimanek şorbe ye, ku ji zimanên farsî, erebî û tirkî pêk hatiye...û tenê du–sê sed peyv wek “peyvên nenas” tînin qeydkirin û tê îdia kirin, ku gava erebî, farsî û tirkî ji nav hatiye derxistin, wê çaxê kurdî wek zimanek qels xweyî dike, ku tenê ji 2–3 sed peyvyan peyda dibê.⁽³⁾ Îro jî nijadperestên Tirk îdia dikin ku zimanek kurdî tune ye. (Vira bitikînin: <http://www.angelfire.com/tn3/tahir/...>)

Çima nijadperestên Tirk xwe ew qest pê didin bawer kirin, ku peyvên wek “kon”, “îsot”, “kanî” ûhd. peyvên esil–tirkîne li ber çavane... Ev derew ji hîsên kompleksî yê ku bi zimanê tirkî rû didin ve girêdayî ne, ji ber ku hemû wan peyvên di tirkî de ji zimanên biyanî hatine girtine. “Çadır” (kurdî: kon) û “çeşme” (kurdî: kanî) ya tirkî ji farsî hatine girtine. Peyva “biber” (kurdî: îsot) jî ji Yewnanî hatiye girtine. Ev kompleksa nijadperestên Tirkan ew qest me-



Konên zozanan

zin bûye, ku ji aliyê lîderê Tevgera Netewperestî ya Tirkan (MHP) Alparslan Türkeş kovarek bi zimanê kurdî bi navê “KON” hatiye derxistine. Armanca vê kovarê bêguman ne lêkolîna li ser zimanê kurdî ye, armanc eşkereye: Ajojina propagandayên nijadperestî yên Tirkan li ser gel û mêjiyê Kurdan e...⁽⁴⁾ Di vê rêça kemalîst û şoven de gelek nivîs ji aliyê dewlata Tirk ve hatin birêvebirin û finanse kirin wekê nivîsa Profesor Dr. Mehmet Eröz “Dogu Anadolunun Türklüğü” (=tirkîtiya Anatola Rojhilat), ku hewldide gelek peyvên kurdî wek esil–tirkî bide xweyî kirin.⁽⁵⁾

Dê were, xweliyê li serê nizanên me neke, ku îdiayên Tirkan bê lêpîrsîn û lêkolîn yek û yeko têxin nava ferhengên kurdan, mîna ku di Wikîferhengê de têye dîtîn. Binêrin peyva “kon” ê:

“Herwiha kûn, hevrehê zazakî kome, ji tirkî kom (war, havîngêh), têkilî konut (war, cih, mesken), konak (qesir, qonax > kurdî qonax), kon–mak (bi cih bûn, war danîn, li derekê jîn), koy–mak (danîn, bi cih kirin), komşu (cîran). Lê hêjayî gotinê ye ku peyva „kon“ bi xwe bi maneya „çadır“ di tirkî de nîne yan nemaye. Li cihê wê peyva esil–îranî çadır li kar e.”⁽⁶⁾



Kovarek propagandîst û nijadperestên Tirkan, ku bi navê *kon* derketiye.

Ji bo dîtina rastiyê, minê tevîrê xwe birra kir û mercek ji tûr derxist, ku bizanim bilem peyva “kon” ji ku têye...

Ji ber nêzikîtiya zimanê pehlewî bi kurdî ve min berê ferhengê pehlewî-înglîzî vekir û li peyva “tent” ya Înglîzî ji bo “kon”ê gerîyam. Di encamê de min ji bo “tent” ya Înglîzî di beşê pehlewî de “maşk, wiyân” dît. Belê “maşk” peyva sûmerî ye (Masku), ku ketiye gelek zimanên Rojhilata Navîne û maneya xwe ya resen “çerm/sî” ye. Ji ber ku kon berê ji çerm û mûyê bizinan dihat çêkirin, êşkereye ku çima “maşk” di pehlewî de ji bo ko-

nan jî hatiye bi kar anîne. Di kurdî de jî ji bo çermê, ku dew tê de têye kayin re hîn jî “meşk” tê gotin.

Lê bala min ji vê bêtir peyva “wiyân” kişand. Ev peyva di farsiyaya modern ya zû (Early New Persian) de bûye “giyân”.

“wiyân [wyd’n / MiddleP. “wy’n”, NewP. “giyân”] tent, yanî “kon,çadir”⁽⁷⁾

Wekê din jî jiyana koçerî jî di vê peyvê de têye dîtine:

1. wiyaban [w(y)d’p’n / Parthian “wy’b’n”, NewPersian “biaban”] desert, yanî di zimanê partî de jî maneya xwe “çol,sehra” ye. (Zimanê partî jî wek kurdî zimanek Îranî ya Bakûr-Rojavayî ye, bi taybetî nêzikîtiya xwe kûr bi lehçeya kirmanckî ve tê zanîn û ji aliyê gelek lêkolînvanan ve wek berzimanek kurdî tê hesabandin.)

2. wiyaban [wyd’j)n’] astray, wandering; deluded, yanî “gerîyan, koçberî”

3. wiyabanig = wandering, itinerant, yanî gerîn/seyhata meslekî.

Gava em rêça peyvên “wiyân” yan jî “giyân” taqîb dikin, em di gelek nivîsên etimolojîk bi hêsanî wekê di nivîsên Garnîk Asatrîan de jî dikanin notên zelalkirî bibînin. G. Asatrîan di Ferhengê

forms in dictionaries and studies on the history of the vocabulary of different Iranian languages (fortunately, many of them are provided with excellent word indices). Furthermore, one should simply change the title word of the entry into the word from the illustration belonging to the target language. For example, if a certain etymological glossary, say, Persian, contains the entry “*giyân* “tent”, from OIr. **widāna*-; cf. Parth. *widān*, Baluchi *gidān*, Bakhtiari *guhān*, etc.”, then we correspondingly change the Persian *giyân* into Baluchi *gidān* (if the target is Baluchi), or *guhān* (if our aim is to compile a Bakhtiari dictionary), while the rest will be given as illustration. At bottom, as a bibliography, one can cite a great deal of multi-language literature borrowed both from the given publication, or from other sources, so that the average honest reader will not bother to inquire whether the suggested

Ferhanga Etîmolojîk a kurdî, Garnik Asatrian
(Etymological Dictionary of Kurdish, Garnik Asatrian)

ya etîmolojîk ya kurdî ⁽⁸⁾ qeydkirîye, ku peyva “*giyân*” bi eslê xwe ji peyva Îraniya Kevn “*wîdâna*” perisiye, di zimanê Partî de ev peyva “*wîdân*” bûye. Paş guherîna denga “w” heta “g” ev peyva ji zimanê Belûcî re wekê “*gîdân*” û ji zimanê Bextiyarî re jî wekê “*guhân*” mîras maye.

Di zaravayê Goranî de jî ji bo peyva “mal”ê “yana” tê gotin, ev jî ji peyva “*wî-dana*” perisiye. ⁽⁹⁾

Belê peyva kurdî “kon” bi “k”-yek bêpif têye telfûz kirin. “Kon” û hemû peyvên ku bi dengê bêpif destpêdikin orjînalîteyên kurdî ne û nikanin wek nimûne ji tirkî derbasî kurdî bibin. Husênî Miho di hinek nivîsên xwe de îdia dike, ku peyvek

tirkî ku di eslê xwe de bipife dikane wek bêpif derbasî kurdî bibe, lê ev dîtinek şaş û başnizanîna dengguhartin ya nava tirkî û kurdî de ye. Di tirkî de “k” ya bêpif nayê bi kar anîn û hemû peyvên, ku ji tirkî bi “k” ya bipif (sert) derbasî kurdî dibin wek “q-” têne telfûz kirin, wek nimûne peyva “karakol”, ku bi eslê xwe Moxolî ye û di ser tirkî de derbasî kurdî bûye dibe “qereqol”, peyva “kirmak” dibe “qirkirin”, peyva “korumak” dibe “qûrkirin” ûhd.

Denga “k” ya bêpif di kurdî de gelek caran di eslê xwe de ji guherîna denga “g” peyda dibe. Ji “gîlor” bûye “kilor”, ji “gundir” bûye “kundur”, ji “gil” bûye “kil”,

ji “gurm” bûye “kurm” ûhd.

Di vê rêçê de peyva “wiyân” ku di zimanê Pehlewî de belî dibe, bi guherîna denga “w” heta “g”, ku di zimanên Îranî de ji zimanên antîk heta yên modern gelek caran têye dîtîn ev peyva guheriye “giyân”.

Di kurdî de jî wek nimûneyên, ku me li jor dayî, denga “g” rabirtiye dengê “k” ya bêpif..

“wîdâna” < “wîdân” < “wiyân” < “giyân” < “kiyân” < “kiyon” < “kon”

Paşê jî denga “a”, ku di gelek zimanên Îranî û di devoka Kurmancî ya Meletî de jî hêye û dengê di nava “a” û “o” de ye, şuna xwe tenê ji “o” re hîştîye û dengên “-iy-” jî wenda bûne.

Denguhartin li şî870947313 lê “kon” jî nesekiniyaye, di devoka Kurmancî ya Meletî de jî bi

“ç”-yek bêpif bûye “çun”, ji ber ku li Meletî denga “k” jî gelek caran diguhure “ç” wekê:

Kor > Çur

Tirkî > Tirçî

Kon > Çun

Lawkê min > Lawçî min

Belê lêkolîna peyva “konmak, konak, konu” ya Tirkan ne karê mine. Ku eleqeyek xwe bi peyva esil-kurdî yan esil-Îranî “kon” ve hêye, bila tirk bi xwe lêbikolin...

Bi vê nivîsê min jî xwest hindika xwe rindik tevî bêjenasiya kurdî bikim. Ku Husênî Miho xwe wek pêxemberê peyvan îlan bike jî, netirsîn û şaşitiyên wî bi wî bi nas-kirin ‘din..

Bi hêviya etmînolojiyek zelal, di xêr û xweşiye de bimînin.

(1) Ji bo xerîteya Hîva Adanî mêze bike: (<https://de.wikipedia.org/wiki/Fruch...>)

(2) Ji bo Şoreşa Nûlatî “Neolithic Revolution” bixwîne: (<https://en.wikipedia.org/wiki/Neoli...>)

(3) “Güneş Dil Teorisi”, Wikipedia (<https://tr.wikipedia.org/wiki/Güne...>)

(4) *Kon* dergisi ya Alparslan Türkeş (<http://www.haberler.com/alparslan-t...>)

(5) *Doğu Anadolunun Türklüğü* (=Tirkîtiya Anatola Rohhilat), Prof. Dr. Mehmet Eröz (<https://books.google.de/books?id=3z...>)

(6) Wikiferheng, peyva “kon” ê: (<https://ku.wiktionary.org/wiki/kon>)

(7) *A Concise Pahlavi Dictionary*, D. N. MacKenzie (<http://www.rabbinics.org/pahlavi/Ma...>)

(8) *Etymological Dictionary of Kurdish*, Garnik Asatrian (<https://issuu.com/derosnec/docs/gar...>)

(9) *Iranian Languages from Iran and Turan / Zur Lage der Gorani-Dialekte und ihrer Erforschung*, Ludwig Paul (<https://archive.org/stream/IranianL...>)

Têbinîyek:


Dîroka Kurdîstanê Di Çapemeniya Swêdî de

Rohat Alaom, Apec, 2016, 302 rupel

Jordan

Rohat Alaokom wek lêkolîner xebateka bêhempa dike. Heta niha bi dehnan berhemên lêkolînî yên li ser dîrok û çanda kurdî amade kiriye. Îsal kitêbeka lêkolînî ya dîrokî bi navê "Dîroka Kurdîstanê di çapemeniya swêdî de" ji aliyê weşanxaneyê Apecê de hat weşandin.

